



*Li kolanan ji gelê tirk li ser agirbestê dîtinên balkêş:*

# Bila dewlet agirbestê

## bibîne

■ Ji bo em dîtinên gelê tirk ên li ser agirbestê wergirin, me berê xwe da nav kolanên Stenbolê. Dîtinên gelê tirk ên li ser şer bi me jî gelekî balkêş hatin. Gelê tirk hay ji agirbestê heye û bi awa-  
yekî şermokî be jî, daxwaza aştiyê dike. Em li kolanan geriyan, bi karkeran re, esnafan re, jinan  
re axivîn. Bi taybetî axaftinên me yê bi leşkerên kevin û malbatên leşkeran re, rastiya şer baş dan  
xuyakirin. Digel wê em bi leşkerên ku di şer de gazî ketine re jî axivîn. Em li kolanan li bersiva van  
pirsan geriyan: Şer çi ye? Aşti çi ye? Dewlet divê bersiva agirbestê bide an na? R 3

Hevpeyvîn: M.Hemo: Divê em bi rewşa xwe serbilind bin - Rûpel 8-9

Şehîd: Ew bi Kurdistanê re zewicî - Rûpel 6

Wêje: Seydayê Keleş - Rûpel 10

Vengûvaz: Polîsê bêvardayin teva nêzanê - Rûpel 15


Nejdet Buldan: Nijde (2) rpl.5

Mirhem Yiğit: Hevaltîpa berdewam... rpl.7

Hasan Kaya: Agirbestê barê me girantir kir rpl.13

Sîrwan Rehîm: Mihrecanî Şanoy Kurdî rpl.11

## Azadiya WELAT



SAMI TAN

Heke îcar jî dawî li agirbestê bê, berpîrsê vê yekê ne gelê kurd e. Lewre gelê kurd aşîxwaziya xwe bi awayekî vekirî da zanîn. Kesên ku agir ji devê wan dibare rayedarên tirk in.

**D**i ser agirbesta ku Serokê Giştî yê PKK'ê daxuyand re du hefte derbas dibin. Lê li hêlekê xwekerkirina çapemeniya tirk û li hêla din provakasyonên hêzên dewletê yên ji bo têkbirina agirbestê temenê wê kurt dikin. Dêrdorên ku haveyna aşîyê davêjin behrê jî di nav de li ser agirbestê bêdengiyekê xwe li bedena kes û saziyên di bin sîwana komara tirk de pêçaye. Kirasê vê bêdengiyê ji aliyê MGK'ê ve hatiye dirûtin. Gelek kesî bê pîrs û pîrsîrêk ev kiras di ser bejn û bala xwe de berdaye.

Dêrdorên ku Protokola Amasyayê wekî ayetên Quranê dibînin jî bi helwesta xwe didin zanîn ku biryara MGK'ê jî bo wan ji her tiştî girîngtir e. Kesên ku dema qala komara karkeran a kurd û tirkên dikirin, careke din diyar dikin ku ew di zîmeta kê de ne. Li şûna guh bidin dengê aşîxwazê gelê kurd, diçin li kongreyên kedkaran provakasyonan derdixin.

Êdî mirov nizane ka dê kengê

## Agirbest û bêdengî

MGK'yê kilîta devê wan veke, da ku ew li axaftinê vebin. Lê heke îcar jî dawî li agirbestê bê, berpîrsê vê yekê ne gelê kurd e. Lewre gelê kurd aşîxwaziya xwe bi awayekî vekirî û zimanekî xweşik da zanîn. Kesên ku agir ji devê wan dibare rayedarên tirk in. Dewleta tirk ketiye milê Îsraîl û Amerîkayê gefan li dewletên cîran dixwe. Wisa xuya ye ku ev hevkarî dê belayên mezin bîne serê gelên Rojhilata Navîn. Lê mixabin dêrdorên ku li ser navê misilmantiyê tevdigerin jî bi dûvika leşkeran girtine û tevî hemû şeqam û kotekên ku ji wan dixwin jî dev ji dûvika wan bernadin.

Ji niha ve tiştên diyar hene. Bo nimûne, van rojan qala develûasyonê tê kirin, ew jî tê vê wateyê ku dê mehmîza (meaş) kedkaran ji nişka ve bi rêjeyeke mezin dakeve. Dîsa bi vebûna dibistanan re mijara zêdekirina xeracên û destavêtina şerpeyê dê were rojevê. Bi arizîkirinan (özelleştirme) bêkar û bêsêndiqabûn, hêsankirina jikaravêtina karmendan û gelek pîrsîrêkên din li ser rîya hêzên dijber in. Lê ev hêz jihevketî

û bêsêrûber in. Piştî tevgera karkeran MGK'ê bi rîya CHP û İP'ê dest avêt tevgera karmendan jî. Provakasyona dawîn a di kongreya KESK'ê de nişan dide ku xebatên MGK'ê encam dane.

Bandoreke taybet a şerê qirêjî li ser van arîşeyan heye. Bandora şer dualî ye; li aliyekî fatûraya şer ji bêrika kedkaran derdikeve, li aliyê din dagirker bi alîkariya şer şovenîzmê xurt dikin. Hestên şovenîst li ber çavên civatê perdeyeke reş pêk tîne. Ew perde nahêle ku cemawera tirk rastiye bibîne, li berjewendiyên xwe yên çîneyetî bifikire. Bang û dirûşmeyên dagirkeran ji bo civatê watedartir tîne.

Ji ber vê sedemê agirbest jî bo dêrdorên azadîxwaz derfeteke baş e. Lê heke MGK karibe demeke dirêj vê bêdengiyê li ser civakê ferz bike û provakasyonên hêzên dewletê bidomin, dê ew derfet jî wekî yên din di avê de biçe.

## Vegera welat vegera serfiraziyê ye

FADIL AYDEMİR

## Ferhengok

aramgeh: cihê  
bêhnvedanê  
arîşe: pîrsîrêk  
amûr: navgîn  
ajal: sewal-heywan  
awêne: neynik  
awarte: îstîsna  
bêhempa: eşsiz  
berginde: berdêl  
berjewendî: menfeet  
cemawer: girse  
ciyawazî: cudahî  
çîneyetî: sinîfsal  
danîşîn: rûniştin  
danîşan: gösterim  
daçek: edat  
dirûv: teşe-şekil  
gamaro: ambargo  
histrandin:  
hevîrkirin  
haveyn: maya  
hîndarî: alîştirna  
komkuji: tevkuji,  
qirkirin  
mehmîz: meaş  
nîgaş: razber-soyut  
nîqaş: gengeşi

nijde: çete  
navbernav: sernavê navberê  
pêşangeh: sergi  
rasernav: üstbaşlık  
ravekirin: şîrovekirin  
rawe: kip  
raweya bilanî: istek kipi  
rêje: oran  
ristin: honandin  
rêzenivîs: dizi  
yazî  
rêpîvan: qayîde  
rêbaz: azîn, metod  
sernav: başlık  
seretayî: yekemîn, pêşîn  
şarîstanî: bajarvanî-medeniyet  
şayes: teswîr  
şayesandin: teswîrkirin  
tewang: büküm  
têkûz: yalın  
zayend: cinsiyet  
zivêr: bêzar, aciz

**S**oreşa Kurdistanê îro gihiştîye merheleya herî bilind. Bi her awayî jî gavên dîrokî re amade ye. Dem dema serfiraziyê ye jî bo gelê kurd û Kurdistanê. Lewre pêşketinên di şer de pêk hatine, îro bandora xwe didin ser polîtîkayên navneteweyî û mora xwe li demê dixin.

Dijmin jî destvala nasekine. Çiqas dikeve tengasiyê, ewqas xwe bi şerê qirêj ve girê dide. Hemû hêzên xwe bi kar tîne û dixwaze pêşî li pêşketina şoreşê bigire û bifetisîne. Ji hêlekê ve bi awayekî bêsînor şerê psikolojîk dimeşîne, ji aliyê din dixwaze xiyaneî careke din bi ser bixe. Di Kurdistanê de yên ku xiyaneî napejirnin tene qetilkirin. Dijmin bi darê zorê, bi tevkuji û gemaroyê (ambargo) bi ser gel de tê, bi koçberkirinê Kurdistanê vala dike. Bi vî awayî dixwaze gel ji gerîla, ji welêt û şoreşê dûr bixe.

"Em di vê sala 25. de ku xwedî wateyeke mezin e, şerê ku dijmin dixwaze li dijî wî careke din vegera cewher, li hemberî biyanîkirina mezin vegera nasnameyê; ne bes vegera welêt bi tenê, vegera dîrokê; ne bes şer tenê, vegera serfiraziyê; ne bes îspatkirina xwe tenê, gavên vegera serkeftinê davêjin." Di sersala 98'an de Serokê Neteweyî ev nîrxandina balkêş kir: "Belê eniya şer her roj firehtir dibe, şer her diçe dijwar dibe û ji her demê zêdetir gavên serkeftinê tîne avêtin."

Polîtîkayên li ser kurdan hatine bikaranîn bêhempa ne. Encamên van polîtîkayan jî hêla neyînî ve bandoreke gelekî mezin li ser gel çêkiriye. Ji welêt, ji netewebûnê û nasnameyê dûrketin encamên herî balkêş in. Îro gelê kurd bi piranî li derveyî welêt dijî. Her çiqas têkilîya piraniya gel bi şoreşê re hebe jî, ne li gorî xwesteka şer û demê ye. Di vê pevajoyê de şer bi her awayî tevlêbûne dixwaze û mezinbûna şer barê mirovên

**Îro ji her tiştî pêştir berxwedana li hemberî koçberkirinê pêwîst e. Dijmin dixwaze li ser axa welêt, mirovên bi rûmet û welatparêz nemînin. Ev polîtîka divê di cihê wê de were pûçkirin.**

welatparêz girantir dike. Lewre dijmin bi awayekî bêsînor şerê qirêj dimeşîne. Îro ji her tiştî pêştir berxwedana li hemberî koçberkirinê pêwîst e. Dijmin dixwaze li ser axa welêt, mirovên bi rûmet û welatparêz nemînin. Ev polîtîka divê di cihê wê de were pûçkirin. Rast e, gelê kurd bi lehengî û fedakariyek mezin berxwedanên bêhempa dimeşîne. Bi vî û çêke mezin xwe bi Partî û Serokatîyê ve girêdaye. Çi li welêt dibe, çi jî li derveyî welêt dibe, şer û berxwedan dike. Ev pêşketina han jî bo gelê Kurdistanê rûdaneke dîrokî û nû ye. Tiştê bal-kêşê din jî ev e ku, êdî kurd dibin xwe-

diyê saziyên netewî û ber bi dewletbûnê ve gavên mezin tîne avêtin. Di vê pevajoyê de li her derê geşkirina şer pêwîst û girîng e. Çawa di giyanê de vegera welêt û girêdana şer tê afirandin, welê divê gund û bajarên hatine valakirin jî nû ve werin avakirin; jiyanekê bi berxwedanê li hemberî dijmin li ser axa welêt gereke were pêk anîn. Ev gavavêtin jî ber du sedeman girîng e. Ya yekemîn; hêviyên dijmin di vî warî de divê bi vegera seraxê were qutkirin, ku dijmin nikaribe tu gavan bavêje. Ya duyemîn; şer hatiye merhela azadkirina herêman. Saziyên neteweyî tîne afirandin û ji bo ku li welêt jî bi cih bibin xebat tîne kirin. Gelek herêm îro hatine valakirin. Ji bo perçebûn û belawelakirina li Kurdistanê, ji holê were rakirin û welat ji saziyên dewletbûnê re amade be, vegera seraxê gaveke girîng e. Nîrxandina ku Serokê Neteweyî ji bo vê sa-

lê daye xuyakirin jî bo pêkanîna van gavên dîrokî ye. Yanê, ji bo dijmin fermana mirinê, ji bo gel serfiraziya mezin e. Lewre, vegera seraxê; vegera cewher e. Cewher; giyana azdiyê ya ku ji Kawayê hesinkar dest pê dike, bi Kawayê hemdem Mazlum Doğan, bi Kemal, Hayrî, Zilan û Semayan di vê demê de gihiştîye qada herî bilind û jiyanekê bêmîrin daye afirandin. Vegera welat, vegera cewher di kesayetiye de pêkanîna van nîrxên mezin e. Gihiştina kesayetiyeke serfiraz e. Ji bo gelê kurd û mirovahiye jiyanekê bi rûmet, ji bo dijmin mirina herî mezin bi vê gavavêtinê pêk tîne.


Li kolanan ji gelê tirk li ser agirbestê dîtinên balkêş:

# Bila dewlet agirbestê bibîne

**Mehmet Yılmaz (Kevneleşker):** "Lehengên çiyayên li wê derê gerîla ye. Leşkeran perwerdehiya çiya û ya gerîlatiyê nedîtine. Dewlet ditirse ku helikopteran bişîne cihê şer. Femandarên min wiha digotin:" Eger em helikopteran bişînin, wê gerîla bînin xwarê. Buhayê wê trilyonek e!" Çima leşker bînin kuştin? Leşker di nav xwe de qala aşiyê dikin."

Piştî ku Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê Abdullah Öcalan agirbest îlan kir, aştî kete rojê gelê kurd û tirk. Bi giştî li gelek cihên cihanê biryara aşiyê weki gaveke girîng û erênî hate dîtin. Digel wê yekê gelek dewletan, Parlametoya Ewropayê û muxalefeta li Tirkîyeyê ji Tirkîyeyê xwestin, da ku bersiva agirbesta PKK'ê bide. Her wiha Şaxa Jêrin ya Parlametoya Rusyayê DUMA'ê peşniyaza bersivdayina agirbestê li Tirkîyeyê kir. Lê heta niha rayedarên Tirkîyeyê di vî warî de tu gavên berbiçav neavênine. Li aliyê din helwesta gelê tirk zêde naye rojevê angoyê bi awayekî klasik tê zimên. Me, ji bo em dîtinên gelê tirk yê li ser agirbestê wergerin, me berê xwe da nav kolanan Stenbolê. Dîtinên gelê tirk yê li ser şer bi me ji gelekî balkêş hatin. Gelê tirk hay ji agirbestê heye û bi awayekî şermokî be jî, daxwaza aşiyê dike. Em li kolanan geriyar, bi karkeran re, esnafan re, jinan re axivîn. Bi taybetî axaftinên me yê bi leşkerên kevî û malbatên leşkeran re, rastiya şer baş dan xuyakirin. Digel wê em bi leşkerên ku di şer de gazî ketine re jî axivîn. Em li kolanan li bersiva van pirsan geriyar: Şer çî ye? Aştî çî ye? Dewlet divê bersiva agirbestê bide an na? Gelê tirk bo aşiyê amade ye an na?

Seval Taka (Taka leşkerekî gazî ye. Ew niha li Stenbolê di Komeleya Malûlên Şer de kar dike): Şer tişteki ne baş e. Dema ku her tişt bi axaftinê çareser bibe, pêwîstî bi şer tune ye. Aştî ji bo hemû civakan tê wateya azadiyê. Ez û hemû hevalên xwe ên leşker, çî gazî, çî jî sax aşiyê dixwazin. Daxwaza me jî ev e. Em naxwazin xwin bê rijandin. Em naxwazin ku organên me winda bibin. Kî dibê bila bibe! Dixwazi bila rêxistina terore (PKK) be angoyê dewletek be, ji bo me ya gi-



A. Öztürk

ring aşiyê.

## "Koka me hemûyan ji kurdan têt!"

Serpil Sipahi (Kevanî, Trakya): Çî kurd çî jî tirk, li cem me ferq nake. Koka me hemûyan ji kurdan têt. Divê mafên kurdan bînin dayin. Bira li bira dixê. Gelek leşkerên me hatin kuştin. Par li Batmanê xwarziyê min di şer de hate kuştin. Berî ku bimire ji ber vî şerî gelekî xemgîn bû. Siberoj wê zarokên min mezin bibin, wê herin leşkeriyê, wê cesedê wî ji me re bê. Dilê gelek dayikan şewitî. Haya min ji agirbestê heye. Bila dewlet bersiva wê bide. Wê ji bo me hemûyan baş bibe. Divê kurd ji bi zimanê xwe biaxivin. Ji ber ku zarokên kurdan li dibistanan bi kurdî dixavin, bila li wan neyê girtin.

Necmiye Deniz (Kevanî, Trakya): Welatê me xweş e. Bila tu kes jî tu kesî netirse. Bila herkes dilfireh be. Weki hevala min got, eger em tirkî navê nênan zanibin divê bi kurdî jî em navê nênan zanibin. Mesela ez nizamim. Ji bo wê jî divê şer raweste. Bila dewlet agirbestê qebûl bike.

## "Leşker di nav xwe de qala aşiyê dikin"

Mehmet Yılmaz (Samsun, Li Sêwasê leşkerî kiriye. Niha xwedî market e): Di reşahiya şevê de me dişînin şer. Çima Kobrayan naşînin. Ew êlekên ku li xwe dikin, wan naxwazin. Ew êlek bo şarjoran in. Hin kes dibêjin qey ew êlekê polatî (çelik yelek) ne. Divê 'sıcak temas' nebe. Ji ber ku lehengên çiyayên li wêderê gerîla ye. Çiya ji wan tîn pirsin. Leşkeran perwerdehiya çiya û ya gerîlatiyê nedîtine. Dewlet helikopteran naşîne cihê şer. Ditirse. Femandarên min wiha digotin: "Eger em helikopteran bişînin, wê gerîla bînin xwarê. Buhayê wê trilyonek e!" Çima leşker bînin kuştin? Çî heqê wan li me heye! Leşker di nav xwe de qala aşiyê dikin. Lê belê ji serleşkeran gelekî ditirsîn. Leşker ji şer û 'sıcak temas' ê gelekî ditirsîn. Hevalên me digotin, di şer de leşkeran serê xwe dixistin bin kevîran û heta dawîya şer serê xwe dernedixistin. Digriyan û digotin: "Xwedawo! Me xelas bike!" Agirbest baş e ku bimese. Heft xwezî bi aşiyê. Agirbest ji bo leşkeran ji gelekî girîng e. Gelê tirk jî bo aşiyê amade ye. Ji kuştina zarokên xwe leşkerên xwe û polîsên xwe têra xwe aciz bûye.

Şerif Selim (Stenbol, Memûr): Bi rastî psikolojiya vî kesî gelekî balkêş bû. Pêşîn ji pirsên me xwe da alî. Piştê jî avête dewletê û daxwaza aşiyê kir. Şerif Selim wiha axivî:

Ji bo sekinîna şer, divê koka wanê serê çiyê bê qelandin. Wê şer bidome. Bi rastî ê me nizanin tîkiliyan deynin. Ew ê li serê



N. Deniz - S. Sipahi

Necmiye Deniz (Kevanî, Trakya): "Welatê me xweş e. Bila tu kes jî tu kesî netirse. Bila herkes dilfireh be. Weki hevala min got, eger em tirkî navê nênan zanibin divê bi kurdî jî em navê nênan zanibin. Mesela ez nizamim. Ji bo wê jî divê şer raweste. Bila dewlet agirbestê qebûl bike."

çiyê dixwazin dewletê çêkin. Bi wê nabe. Heya min ji agirbestê heye. Stranek heye. "Kardeş Kardeşi Vurur mu? (Ma bira li bira dide?) Ez jî wisa difikirim. Madem wisa ye, bila aştî çêbibe. Ew diçe wê derê bombe dike, ê din tê wê derê bombe dike. Yekî din tê vir bombe dike, dewlet jî hêrsa xwe ji wan derdixe.

## "Dema ku em jî birçî bimînin, emê tevî PKK'ê bibin"

Ali Osman Öztürk (Trakya, Boyaxkar, Koçber): Ew ê serê çiyê jî mirov in em jî. Tirkîye ji aliyê mafiyayê ve hatiye dagirkirin. Dema ku em jî birçî bimînin, emê herin serê çiyê tevî PKK'ê bibin. Divê ev şer xelas bibe. Divê em nanekî germ bibin mala xwe. Dewlet bi tenê bi kêrî xerckirin û xwarinê têt. Haya min ji agirbestê heye. Divê dewlet jî bo menfata gel bersiva agirbestê bide.

Hasip Karaoğlu (Kayserî, Karker): Tu halê me dibîne! Hemû jî ber vî şerî ye. Gel aşiyê dixwaze. Ma kes dixwaze ku bikeve wê halê min! Rojek berî rojekê divê ev şer bigêve. Dewlet bila aqilê xwe bikar bîne. 20 sal e ew pere ji berîka me diçin. Min jî wê demê leşkerî kir, lê hê jî ez dibin şoqa wan rojan de me.

Aydın Bahçecik (Sêwas, kevnepehlewane mîlî): Em hemû jî ber vî şerî birçî ketin. Mezinê dewletê baştir zanin, Aştî bê, wê baş bibe. Em hemû insan in. Madem aliyê kurda agirbest îlankirine, bila mezinê me jî wê bibînin. Dinya xera nabe. Li vî dinya derewîn, em çima dilê hev bihêlin.

## ÇAVDÊRÎ

"SEROKÊ ME DIBÊJE LI WÊ DERÊ ŞER NÎN E!"

Dema mirov li nav kolanan Stenbolê digere û bi gel re hevpeyvînan dike, li rastî jiyana rastîn a wê civakê têt. Belê em çêlî civaka tirkî dikin. Her çiqas ji aliyê ku tê xuyan ve hestên vî gelî ji aliyê şerxwazan ve hatibin basko kirin jî, bi gerekê di nav kolanan, mirov dikare bi hesret û bêrikirîna rojên bi çûyê wî gelî bihese. Di gera xwe de em jî li rastî van tiştan hatin. Ji kalên 70 salî bigirin hetanî ciwanên 20 salî, bi êşa vî şerî dijîn. Kesên ku em bi wan re axivîn yan leşker yan jî malbatên leşkeran bûn. Digel wê yekê em pîrgî kesên bêsol jî hatin. Bêguman pêşî em jî tirsîyan. Me got, dema em pîrsa agirbestê ji wan bikin, dibê ku êrîşî me bikin. Lê em di gera xwe de rastî tistên berevajî dîtina xwe hatin. Ji bo ku nûçeya me bi taybetî li ser gelê tirk bû, me xwest em herin Ordueviya li Ak-sarayê, bi dayikên leşkeran re bipeyvîn. Lê ji devê deriyê Orduevi em nehewandin hundir. Em disa nesekinîn. Vê carê jî me xwest bi leşkerên gazî yê ku li Komeleya Malûlên Şer (Harp Malûlleri Derneği) dîmînin re, biaxivîn. Pêşîn leşkerekî agahiyên balkêş dane me. Lê piştî ku bi xêza rojnâmeya me hesiyar, hevîdîna me red kirin û heman kesî ev tişt jî me re gotin: "Serokê me dibêje li wê derê şer nîn e. Komek insan gihîştîye hev çalakîyan li dar dixin." Lê berî ku xeberê bigihînin serokê komeleyê wisa nedigotin. Belê dema mirov jî wê yekê derûniya vî gelî tahlîl bike, dê rastî gelek tiştên din jî bê. Diyar e gelê tirk jî rayedarên tirk bêhtir xwedî cesaret e. Daxuyaniya nivîskarê îslamî Abdurrahman Dilipak ya bo Azadiya Welat jî wê yekê destnîşan dike: "Aştî cesaretê dixwaze. Ger aqil û dil bi mirovan re hebe, wê wateya aşiyê fêm bikin. Yê ku tirsonek in şer dikin." Di gera xwe de em rastî wê yekê jî hatin. Gelek kesan digotin: "Dewlet jî aşiyê ditirse."

AZAD ALTUN

# Bajarê zilmê, Stenbol

Derheqê bînpêkirina mafên mirovan de ÎHD'ya Stenbolê her meh raporekê diweşîne û encama bînpêkirina mafên mirovan bi ser navê 'Bînpêkirina Mafên Mirovan' belav dike. Li gorî raporê di meha fîrmehê de bi giştî li Stenbolê 1218 kes hatine girtin. Ji wan 364 kes jin, 802 mêr, 52 kes jî zarok in.

Dema mirov çavê li ser bînpêkirina mafên mirovan derbas bike de rastî gelek tiştên balkêş bê. Bînpêkirinên mafên bîngêhî ên ku li Stenbolê diqewimin nayên hesabê. Stenbol jî wekî bajarekî Kurdistanê her roj bi cudatiya qewmîna xwe di rojê gel de dimîne. Dema mirov bi awayekî hûrbînî bînpêkirina mafên mirovan û bûyerên ku diqewimin bişopîne û li ser hev bicivîne dê pirtûkeke 200 rûpelî her meh derkeve. ÎHD jî di vî warî de her meh encama bûyeran û qewmînan ji bo ku raya giştî agahdar bike raporeke bi ser navê 'Bînpêkirina Mafên Mirovan' belav dike. Bi rastî di rapora meha fîrmehê de hejmarê kuştin, birindarkirin, windakirin, êrişên li dijî çapemeniyê, mafê jiyana bala raya giştî kişand. Li gorî raporê di meha fîrmehê de bi giştî li Stenbolê 1218 kes hatine girtin. Ji wan 364 kes jin, 802 mêr, 52 kes jî zarok in. Ji bilî van yekan li girtîgehên 7 kesî jiyana xwe ji dest daye. Ji ber êrişan 2 kes, ji ber tedawiya ku hatîye astengkirin kesek, her wiha ji ber êrişan 4 kes birindarkirine. Ji rojê rojê de politikaya li dijî girtiyên siyasî ji aliyê gel ve tê rexnekirin. Mixabin, di sa ji her meh girtî beramberî êrişên zor diwar dimînin. Derbarê jiyana xebatê de jî li Stenbolê karkirin ne hêsan e. Ji bo karkirinê tu 'Ewlehiya civakî' tune. An ku bîngê girtin, kuştin ango ji ber qezeya kar birindarkirine, nikarin ji heqê lêcûnên bijîşk û îlacan derkevin. Di vê mehê de jî ji 19 kesên 3 kesên ji ber qezeya kar jiyana xwe wînda kirine, yê ku birindarkirine 13 û yê ku ji kar hatine avêtin 3. Di warê îşkence û muameleya nebaş de jî wekî tê zanîn Tirkîyeyê noteke nebaş hem ji Ewropayê hem jî ji muxalefata navxweyî girtiye. Perwerdeya polisîyan bi normên mirovperwerî nayên kirin. Ji ber ku bi awayekî hovane tînan perwerdekirin êriş û muamele jî bi awayekî hovane tînan kirin. Di meha fîrmehê de 26 kesên para xwe ji muameleya nebaş û îşkenceyê girtiye. Ji 26 kesên 13 kesî jî ber îşkence û muameleya nebaş serî li ÎHD'yê daye. Yê ku îşkence dîtine 12 mêr 1 jî jin e. Bi rastî jî ber ku li Tirkîyeyê mirov nikare çêlî mafan bike, nayê ser zimanê me ku em bêjin mafê xebatê yê karker û kedkaran. Di beşa mafê jiyana de jî li gorî raporê mafê jiyana 160 kesî jî destê wan hatîye girtin. Beramberî êrişên faşîstan 6 kesî, di encama êrişên bi çek de kesekî, di qezeya kar de 3 kesî, di encama teqîna bombeyê de 7 kesî û

di encama êrişên li ser girtiyan de 2 kesî jiyana xwe ji dest daye. Wekî tê zanîn li Tirkîyeyê şovînîzm tê gurkirin. Lewre jî faşîstên sîvil û fermî di her warî de mafê êrişan di xwe de dibînin. Di encama êrişên faşîstan de 3 kes, yê ku beramberî êrişên bi çek mane 2 kes, di qezeya kar de 13 kes di encama teqîna bombeyan de 118 kes birindarkirine. Her wiha ji girtiyên ku beramberî êrişan mane 4 kes birindarkirine. Bêguman dema çapemenî tê gotin hinek rêpivan û qaideyên pîroz ên navneteweyî tînan bîra mirov. Lê li Stenbolê û Tirkîyeyê negengaz e ku ew tiştên pîroz bi bîra me kevin. Ji xwe ne polis ne jî rayedar girîngiyê didine wê yekê. Di meha fîrmehê de

bîrî de biryara girtinê hatîye dayîn. Ligel reaksiyona raya giştî jî di sa dewleta tirk qanûna derbarê derbirina ramanê de naguherîne û her meh ronakbîrekî an jî rojnâmegekerê dixwe girtîgehê. Vê mehê jî, ji bo derbirina ramanê 14 meh û digel wê 6 milyar û 350 milyon ceza hate dayîn. Her wiha ji bilî van yekan jî ji aliyê DGM'yê ve 18 sal cezayê hepsê bo derbirina ramanê hate xwestin.

## Stenbol bi teqînan diheje

Ji bo Stenbolê meha fîrmehê ne wekî mehên din bû. Li çar aliyê Stenbolê gel bi teqîna bombeyan ji xewa xwe şiyar bû. Dibistan, banka, sazîyên fermî, mal, kar-

Stenbolê. Li wê derê jî aliyê polisîyan sîvil ve tê sakinandin. Piştî ku li nasnameya wî meze dikin wî dixin binçav. Di şubeyên terorê re têkoşin de îşkence lê tê kirin. Di îşkenceyê de ji wî re gotine: "Tu endamê PKK'yê yî, tu li ser navê PKK'yê xebatê dikî, em dizanin ku tu li Elmanyayê li ser navê PKK'yê dixebitî. Îtîraf bike em te serberdin". Li ser vî yekê ceryan dane pêşî yê nigê wî, ew di feleqeyê re derbas kirine, ew kirîne bin ava bi tezik û ew tî hiştine. Piştî ku 10 rojan di bin çav de dimînin, tê berdan û serî li ÎHD'yê dixwe alîkariyê dixwaze. Di sa li Bûyûkçekmeca Stenbolê 17'ê meha fîrmehê avahiyeke ku sê qatê hildîweşe. Di encama hilweşinê de 8 karkerên kurd bi xedarî birindarkirine. Li gel xedarî birindarkirina birînan karkerên kurd jî ji aliyê tu kesî ve alîkariyek nayê dayîn. Rojê 17'ê meha fîrmehê Serokê Komîsyona Ciwanan a HADEP'a Stenbolê Celal Eriş ji aliyê polisîyan sîvil ve tê binçavkirin û wî dibîne şubeyên terorê re têkoşinê.

Bi rastî mirov dikare bi sedan mînakên bi vî rengî bide. Li gorî hinek rêvebirên dewletê li bajarekî wisa mezin asayî ye ku ev bûyer biqewimin. Lê li gorî raya giştî ev bûyer ne ji ber xwezaya bajêr bi tevahî bi haydarî ji aliyê politikaya dewletê ve pêk tînan. Stenbol jî ber taybetmendîya xwe gelek neteweyan di nav xwe de dihewîne. Bêhî qûqiya ku li vî bajarê mezin ku wekî welatekî ye tê kirin li gorî lêkolîneran

li tu cihan nayê kirin. Di sa li gorî ragihandina aboriya Tirkîyeyê jî sedî pêncê jî vî bajarî derdikeve. Ji ber vî yekê jî dewlet naxwaze ku kurd li vî bajarî serdest bin. Ligel wê yekê xîzaniya ku li vî bajarî dixuyê li tu cihan naxuyê. Ji berdoşan bigirin hetanî belengazan. Ji %70 kesên ku li vî bajarî dijîn, bê kar û bê mal in. Ji wan %50 kurd in. Dewlet jî dixwaze ji aliyê derûnî û civakî ve kurd û alîgirên kurdan tînan bibe û ji vî bajarî bajo bajarekî din. Bêguman di van demên dawî de kêşeya 'bo Stenbolê wîze' ne bela sebeb kete rojê Walî û Beledîyeya Bajarê Stenbolê. Rojê rojê li Stenbolê rêxistinîbûna kurdan xurtir dibe. Dewlet dibîne ku ji karkerê kurdan bigire hetanî kedkarê kurd ên li vî bajarî piştgiya hevûdu dikin. Wekî bergirî, dewlet dixwaze bi politikaya şerê derûnî kurdên li metropolan ji hev dûr bixe û belawela bike.

AZAD AVAŞÎN



Li Tirkîyeyê û Kurdistanê di meha fîrmehê de bi giştî 4090 kesî para xwebînpêkirinên mafên mirovan girtiye.

nûçagihanên jî para xwe ji êrişên dewletê girtin. 4 nûçegihan beramberî êrişên dijwar man. 8 nûçegihan jî ji aliyê polisîyan ve bi awayekî hovane hatin binçavkirin.

## Derbirina ramanê û azadiya baweriyên

Derbirina ramanê jî li Tirkîyeyê rojevîtin mîjar e. Lê mixabin rojekê jî bo durîstkirina wê qanûnê ji aliyê dewletê ve tu gav nehatin avêtin. Li gorî rapora şubeyê ÎHD'yê ya Stenbolê di meha fîrmehê de ji aliyê RTÜK'yê ve 10 Radyo û TV hatine girtin. Digel wê yekê 31 roj cezayê asêkirina radyo û TV'yan hatîye dayîn. Pirtûkek hatîye berhevkirin, 26 rojname û kovar di sa hatine berhevkirin. Ji aliyê din ve bi ser 6 heb partî, komele û navendên çandî de hatîye girtin û 28 endamên wan sazîyan hatine binçavkirin. Her wiha çalakîyek ji aliyê dewletê ve hatîye astengkirin û derheqê 3 rojnameger, nivîskar û rewşen-

geh û tevî erebeyekê 7 cih hatin bombekirin. Di encama van bombekirinan de 7 kesî jiyana xwe ji dest da, 118 kes jî birindarkirine.

Ji bilî mafên ku li Kurdistanê tînan bînpêkirin li metropolên Tirkîyeyê jî bînpêkirin bala me dikişîne ser xwe. Bi rastî jî salên 1990'yê di sa metropolên Tirkîyeyê jî windakirin, kuştin û faliyetên kontrayî roj bi roj zêde bûn. Li gorî encama van bûyeran tê xuyan ku kurd bêhtir para xwe ji van kirinên kirêt digirin. Zilma ku li ser kurdên koçber tê kirin, digel wê berberkirina mafê xebatê yê karkerên kurd, nişaneyê wê yekê ye. Mînakên jêrîn bînpêkirina mafên kurdan ên li metropolan baştir diyar dikin: Ferit Mercan (Kîxî / 1967) Di 26'ê pûşperê de ji aliyê hikumeta Elmanyayê ve hatîye dersînorkirin. Li balafirgeha Tirkîyeyê 9 saetan di bin çav de hatîye sekinandin. Piştî xwestiyê ku biçe gundê xwe. Bi teqsiyê pêçîn çûye Topkapiya

# Rêzimanê kurmancî

- Wane 29 -

SAMÎ BERBANG

## Raweyên daxwazî

Di raweyên daxwazî de karekî ku tê nîgaşkirin heye. Di van raweyan de karekî ku hûn pêk nehate û pêkhatina wî karî tê xwestin, ji bo pêkhatina wî karî hinek merc pêwîst in. Li vir wekî tîbiniyekê divê em bidin zanîn ku, demên borî yê wan raweyan jî digel wan bîr ravekirin.

### Raweyên daxwazê ev in:

- 1) Raweya divêti
- 2) Raweya fermañî
- 3) Raweya mercî (hekanî)
- 4) Raweya xwestinî (bilanî)

### Raweya divêti

Di pêkhatina vê raweyê de lêkera bingehîn dirûvê lêkera a dema bê digire. Lê di pêkanîna vê raweyê de li cihê daçeka dema bê /dê/ lêkera alîkar viyan heye. Lêkera viyan li gorî dema ku nişan dide dirûvê xwe diguhere.

### Dema niha

Di vê demê de lêkera viyan dirûvê dema niha digire û dibe "divê". Di lêkera bingehîn de tu guherîn pêk nayê.

*Divê ez biçim.*

*Divê tu hevalê min bibinî.*

*Divê ew bîr.*

*Divê em tiştê ku dixwin, pêşî bişon.*

*Divê hûn hejîran bixwin.*

*Divê zarok biçin dibistanê.*

### Dema bê

Ev dem bi alîkariya daçeka dê/wê/ê pêk tê. Lêkera viyan di dirûvê raweya fermañî de ango "bivê" de ye. Dema mirov daçeka dema bê bîr ber dema niha ya ev dem derdikeve holê.

*Dê bivê em herin mala we.*

*Dê bivê ew hinekan ji vir dûr bixin.*

*Dê bivê hûn biçin serdana Xalê Hecî.*

Wekî tîbiniyekê mirov dikare bibêje ku ev dem zêde nayê bikaranîn, her wiha di cihê lêkera viyan de peyvên pêwîst û hewce jî tên bikaranîn. Yanê "Dê pêwîst be hûn herin gund.", "Dê hewce be em herin gund."

### Demên borî yê raweya divêti

Di demên borî de jî tu guhartin di lêkera bingehîn de çênabe, bi tenê dirûvê lêkera viyan li gorî demê diguhere, lê lêkera bingehîn wekî berê di dirûvê dema bê de ye.

### Demên raweya divêti bi giştî ev in:

- 1) Dema niha (divê)
- 2) Çirokiya dema niha (viyabû)
- 3) Rîwayeta dema niha (viyabûye)
- 4) Dema bê (dê bivê)
- 5) Çirokiya dema bê (dê viyabûya)
- 6) Demên borî
  - a) Dema boriya têdeyî (viya)
  - b) Dema boriya dûdar (viyaye)
  - c) Çirokiya dema boriya dûdar (Viya-bû)

### d) Dema boriya berdest (diviya)

Ji wan demên em dê li ser çend hebên ku pir tên bikaranîn rawestî û li ser yê mayî jî çend mînakên bidin.

### Dema boriya têdeyî

Di vê demê de lêkera viyan wekî dema boriya têdeyî "viya" tê kişandin û lêkera bingehîn jî di dirûvê raweya divêti de ye. Bo nimûne em lêkera çûn hildin dest, kesê ku kar dike jî bila kesê yekemîn ê yekjimar be, vê demê dê dema boriya têdeyî ya raweya divêti bi vî rengî be: "Viya ez biçim". Li gorî vê mînakê em dikarin çend mînakên din jî bidin.

*Viya tu bidî.*

*Viya ew xwarinê nexwe.*

*Viya em werin mala we.*

*Viya hûn karekî din bikin.*

*Viya kekê min ji gund derkeve.*

*Viya ew xaniyekî nû bikin.*

### Dema boriya berdest

Di vê demê jî lêkera viyan dirûvê dema boriya berdest "diviya" digire, lêkera bingehîn wekî berê dimîne. Bo ravekirinê çend mînak:

*Diviya ez hevalekî xwe bibin.*

*Diviya hûn min bibin.*

*Diviya em nêr bixwin.*

*Diviya ew daran bibirin.*

### Dema boriya dûdar

Di vê demê de jî lêkera viyan dirûvê dema boriya dûdar digire û dibe "viya-

ye". Çend mînakên li ser vê mijarê jî ev in:

*Viyaye tu werî mala me.*

*Viyaye heval ji gund derkevin.*

*Viyaye em li vir bimînin.*

*Viyaye hinek kesên din vî karî bikin.*

Hinek demên din jî hene, lê di zîmanê nivîskî de zêde nayê bikaranîn, lewre jî em dê bi tenê li ser wan hinek mînakên bidin.

### Çirokiya dema niha

*Viyabû ez yekî bibinim.*

*Viyabû hûn li min binêrin.*

*Viyabû tu dilê kesî nehêlî.*

### Rîwayeta dema niha

*Viyabûye hûn ji wî bistînin.*

*Viyabûye em herin cihekî din.*

*Viyabûye heval te bibînin.*

### Çirokiya dema bê

*Dê viyabûya ez birevim.*

*Dê viyabûya ew binivîsin.*

*Dê viyabûya ew bixwinin.*

Raweya divêti heye, bi awayekî din jî tê sazîkirin. Di vî awayî de lêkera bingehîn jî dirûvê raweya merc-daxwazî digire. Heke em dişa lêkera çûn mînak bigirin, di vî awayî de hevokeke wiha derdikeve holê: "Diviya ez biçûma." Li ser vî awayî jî mirov dikare çend mînakên bide.

*Viya min bixwara.*

*Diviya min dibixwara.*

*Viyabû min bixwara.*

*Viyabûye min bixwara.*

## Nijde (2)

NEJDET BULDAN



Desthilatiya tirk di gotinên xwe de bi tundî êrîşan dibe ser nijdevanan. Belê em jî dizanin ku Alladin Çakıcı, Sedat Peker û hind kesên din hatine girtin.

Dema qala nijdeyan tê kirin hukumet dibêje em ê wan paqij bikin. Yanî dê ji holê rakin. Dewlet dê ji çeteyan bête paqijkirin. Ev gotinên dewletê ne. Bi rastî jî hindê kirinên wê jî hene. Lê belê em bawer nakin. Çima? Li Îtalya û Îspanyayê jî li dijî nijdevanan gelek xebat hatine kirin. Belê li her du welatan jî ew rayedar û berpîrsên dewletê yê ku di nava çeteyên de cih girtibûn, hatin girtin û cezakirin. Bi piranî li Îspanyayê serokwezîr, wezîr û payebilindên nijdevan hatin cezakirin. Ku wan jî li dijî şoreşgerên wî welatî şerekî bi qirêj meşandibûn.

Li Tirkiyeyê ne wisa ye. Sedat Bucak

di nava erebekê de bi destê ezraîl hate girtin. Lê belê azad e. Nijdevanên hevalên wî mirin û berpîsiyariya Mehmet Açar di nav wê saziyê de eşkere bû. Mehmet Açar bi saxî, hevalên wî bi mirin jî hêla dewletê ve hatin pêşwazîkirin. Û seroka nijdevanan bang kir: "Tirkiye bi xebatên we serbilind e." Her wiha endamên wan yê qatil, bi şeweyekî taybet hatin darizandin û hatin berdan. Niha jî li hemû deveran "Tirkiye bi xebatên wan serbilind e." Qatîlê Abdi İpekçi û gelek şoreşgeran Oral Çelik jî hate girtin û azadkirin. Qatîlên Musa Anter, Vedat Aydın, Mehmet Sincar û hemû rewşenbîr, welatparêzên kurd eşkere ne. Rojname bombekirin û girtin eşkere ye. Endamên nijdeyê dibêjin, me ev mirov kuştin. Serok nijdevan M. Açar got: "Ji bo parastina dewletê me bi hezaran operasyon kirine. Û bi îcaze û biryarên dewletê." Şewirmendê serokwezîratiyê rapora xwe amade kir. Li hemû cihanê hate xwendin. Rapor navnişanên hemû bûyeran eşkera dikete ku dewlet e.

Gelek îtirafkaran daxuyanî dane çapemenî û dadgehan. Kurtiva wê, nijde û seroknijde eşkera ne. Navê wê jî dewleta tirk e. Li bîra me ye. Dewra 12'yê rezber

ra 1980'yî de serokê partiya xwînxwar Tırkeş ji zîndanê bang dikir. "Em di zîndanê de ne. Lê belê ramanên me desthilatdar in." Ji ber wê çendê girtina Alattin Çakıcı û yê dîtir gelek ne girîng e. Girtin û cezakirina serok nijdevanan pêwîst e. Ew kî ne? Zeyneba Zer e. M. Açar, Doğan Güreş, S. Demirel, M. Eymür, İbrahim Şahin, Waliyên Herêma Rewşa Awarte, şefên polîsan û tîmên taybetî, hemû fermandarên li Kurdistanê. Serkaniya nijdevaniyê saziyên herî bilind ên dewletê ne. Û gelek kesên bi kurdî diaxivin (serokceş) di nava wê saziyê de ne.

Dewleta tirk, raya giştî dixapîne, Kesên ku ew sazî çêkîrine azad bin, endamên saziyê yê biçûk bêne girtin û dewlet bête paqijkirin. Armanca dewletê ev e. Dawiye jî ew kesên hatine girtin di demeke nêzik de dişa azad bin. Loma ew nijde eşkere bûne. Dibe cihê wan bê guhartin, lê belê êrîş û nijdevanî dê berde-wam bin.

Em bi girtina endamên biçûk ne razî ne. Pêwîst e ku rayedarên dewletê bêne girtin û darizandin. Loma nijde dewlet e. Dewlet jî nijde ye. Mixabin ev tişt jî di pêşerojê de ne mimkûn e.

# Evîndarê Welêt Heval Kendal: Ew bi Kurdistanê re zewicî

Rêheval Kendal (Hidir Alökmen) di sala 1976'an de li Stewra Mêrdînê li gundê Dengiza ji dayik dibe. Zariyê biçûktirînê malbatê û lewre ji delalê ber dilê malbatê bû. Hem jê tê hezkirin, hem jî ji ber ku malbata wî welatparêz e, ew jî, bi wan hestan mezin dibe û ji zarokatiya xwe de bi têkiliyên germve nasdar dibe.

Sal 1990 e. Li Çiyayê Girê Sêra, bi alîkariya çend sîxuran, Artêşa Romê bi 5 hezar leşkeran û tanq û topên xwe êrişî ser 13 hevalan dike. Di encama wê êrişê hovanê de 13 heval ji şehîd dikevin. Rêheval Kendal bûyerê ji nêzik ve, bi çavê serê xwe dibîne û li diji vê hovîtiyê kîna dilê wî gurtir dibe. Ew û çend hevalên wî soz didin ku "Dê heyf û tola wan egîdan bi destê xwe hilînin." Hê temenê wî 14 ye. Jixwe şehîdbûna 13 hevalan bû destpêka serhildanên girseyî yê welêt. Xort û qizên ciwan bi dehan beşdarî nav refên gerila dibûn. Çûn û hatina şervanên azadiyê û çalakîyên wan nav û deng dida. Rêheval Kendal, her çiqasî alîkarî û xebatên wî hene jî, ew pê nayê ser û ji hevalê fermandar destûra derketina xwe dixwaze. Hevalê fermandar, dibêjiyê: "Heval! Hinekî sebir bike, dê roja te bê, tu yê derkevî." Rêheval Kendal xwe aciz dike û dibêje: "Çima we destûra Elî û hevalên din da, hûn destûra min nadin, ku ez derkevim?" Di ser vê yekê re zêde dem derbas nabe, Hevalê Kendal di sa hevalê fermandar dibîne. Berî ku ji hev xatir bixwazin, Hevalê Kendal bi tariyê re, du heb kevîran dixê binê paniya sola xwe û serê xwe hildide û bejna xwe hebekî bilintir dike, tê li ber hevalê fermandar radiweste û dibêjiyê: "Binêr Heval! Ma heya kengî ez ê bisekinim? Vaye bejna min jî, hema bigir wekî ya te ye! De ka destûra min bide, ez derkevim." Hevalê fermandar dikene û lê vedigerîne: "Heval! Bîska din tu ne wilo dirêj bûyî, qey te zêde av vexwariye! Maşeleh tu jî min dirêjtir xuya dikî..." Hevalên wê derê hemû bi vê rewşa wî têr dikenin û xatir jê dixwazin û diçin. Lê belê tim û tim bi Hevalê Kendal re têkiliyê datînin.

## Ji kêfa ji me xatir nexwest

Sal 1993 ye. Temenê wî 17 bû. Heta wê demê, bi her awayî di nava têkoşinê de xebatên pir girîng dikirin. Çend caran hate girtin, lêdan û îşkenceyên dijwar lê hate kirin. Belê bi vîneke bi hêz li ber xwe dida û tu sirên Partiyê nedan dest. Edî dema derketina wî hatibû, ji kêfan re nedibû ku bifire. Ji vir û pê de dayika wî çêtir dizane. Lewre dayika Asya, kêf û şahiya lawê xwe û êvara ku dê beşdarî nav refên gerila bûya wilo dianî ser zimên: "Piştî şivê l... Derî vebû, Xidirê min kete hundir. Berî wî wê şevê ne li mal bû. Jixwe ji min... û bavê wî pê ve kesî me nemabû. Zarok... me yê mezin hemû zewicibûn. Tenê Xidir li ber destê me mabû. Berî ku here, min carna henek lê dikir, min jê re digot: 'Hey tu li mal venahewî, de ka em ê ji te re yekê bixwazin û te bizewicînin, qey ku sebra min û jinikê bi hevûdin bê.' Têr dikeniya û digot: 'Aqilê diya min wekî aqilê Tîsê ye.' Tîsê jî çiroka wê heye. We bihistiye 'Emo û Tîsê.' Emo mîr e Tîsê jî jin e. Tîsê hebekî kêmaqil e. Ji ber wê Xidir ji jinikên bêaqil re digot 'Aqilê we yê Tîsê ye' Wele ez serê we nêşînim. Xidirê min wê êvarê pir bi kêf bû. Ez texmîn dikim ku ew, hê bêşv bû. Ji kêfan re şiv ji nedixwar. Got: 'Dayê ez diçim, tu çi dibêji?'" Min dizanibû, edî tu gotin pere nake. Lê belê min ev gote wî: "Bexê min! Min dixwest ku te bizewicînim. Ji ber ku tu biçûkê min bû, min ahd kiribû ku şeva hina te were, dê ez bi destê xwe hina te nerm bikim û destê te jî dil hine bikim. Lê tu li benda wê rojê nesekinî û te dilê xwe nebijand tu qizan ku ez ji te re bixwazim. Te ji Kurdistanê hez kir. Madem ku te ev kar bi dilê xwe neqandiye, de ka ez ê ji dilê xwe de destê te yê çepê hine bikim. Lê porê te sor e. Xudê ji cem xwe de hine kiribû. Bila ev kul bi min re nemîne. Dawiyê ez dibêjim şîrê min bibe çira Elî û Mihemed li pêşiya te vêkeve. Tu û heval û hogirên xwe bi teyrê cinetê bin. Li vê dinê û li axiretê jî şîrê min li te xweş xelal be bexê min." Min destê wî hine kir. Û gava ku di derî de derket çû, ji kêfa re xatir nexwest. Paşê bi şûn de vegeyriya, ji min xatir xwest û destê xwe yê çepê bilind kir û ji min re hejand. Hê ew dest li ber çavê min e. Ez wê deqeyê tu carî ji bîr nakim. Piştî derketina xwe bi çar meh û deh rojan şehîd ket. Xidir bi Kurdistanê re zewicî. Êdî, qiz û xort nema dilan digirin. Hemû dibin aşiqê Kurdistanê. Şehîd tev ewladê min in. Basa şehîdan dibe, lê tu car navê Xidir derbas nabe. Hema rojekê li ser wî ji tiştê bihata gotin, dê bêhna min derketa. Ne ji bo wî tenê ku basa şehîdan tê kirin ez pir şa dibim, bêhna min derdikeve."



Min." Min destê wî hine kir. Û gava ku di derî de derket çû, ji kêfa re xatir nexwest. Paşê bi şûn de vegeyriya, ji min xatir xwest û destê xwe yê çepê bilind kir û ji min re hejand. Hê ew dest li ber çavê min e. Ez wê deqeyê tu carî ji bîr nakim. Piştî derketina xwe bi çar meh û deh rojan şehîd ket. Xidir bi Kurdistanê re zewicî. Êdî, qiz û xort nema dilan digirin. Hemû dibin aşiqê Kurdistanê. Şehîd tev ewladê min in. Basa şehîdan dibe, lê tu car navê Xidir derbas nabe. Hema rojekê li ser wî ji tiştê bihata gotin, dê bêhna min derketa. Ne ji bo wî tenê ku basa şehîdan tê kirin ez pir şa dibim, bêhna min derdikeve."

## Çiyayê Bagokê mahra wan birî

Wilo diaxive dayika Asya. Lawê xwe û Kurdistanê dişibîne "bûk û zavayê" nû. Rêheval Kendal, çar û deh rojan karûbarê dawetê dike. Dema sal bihar e. Dema kêf û şahiyê, dema evîniyê ye. Ji kêfa dawetê re, seranser govend girtibûn kulîlkên bihara rengîn. Bejna xwe ya nazenîn, bi ber sira bayê xerbî re ditewandin. Kulîlka wan bûka salê bû, bi beşera xwe ya vekirî dawet geş dikir. Gangilok, bi temeziyên kesk û zer rabûbû reqşê. Teyr û tulûr ketibûn ferçê. Awira bilbil ji gulê qut nedibû. Bi dilê xwe yê sotî deng lê dikir. Wekî ku dibêje "Daweta min û te jî pir nêzik dibe."


Xwezayê, bi hemû xweşikiya xwe sînga xwe ji bûk û zavayê dest bi hine re vekiribû. Dema zewacê bû. Wê şevê, Rêhe-

val Kendal, bi Kurdistana xwe re dizewicî... Bi evîneke bêhempa xwe li hev dî pêçabûn. Çiyayê Bagokê bi destê xwe mahra wan dibirî û Cûdî, Gabar, Herekol û Zilan ji ji zewaca wan re dibûn şahid.

Şahedeta wî bi vî şiklî çêdibe. Rêheval Kendal û çar heb heval dadikevine gund (Qersikê). Wê şevê jî dijmin, dora gund digire û êrişî ser malan dike. Her çar heval jî baş dizanin ku çekê biteqînin, dê gund jî binî ve rabe. Çeperê xayin diqelêşin. Sê heval diçin derveyê gund, lê belê hevalê Kendal xuya nake. Ew jî li hevalên din digere belê ji hevûdin qetiyane. Dijmin û ew bi serî li hevûdin diqelîbin. Rêheval Kendal ji gund derdikeve, lê belê dikeve devê tivinga dijmin. Ew û hersê hevalên din bi saeten li ber xwe didin. Lê belê hersê heval jî şehîd dikevin. Tenê ew sax dimîne. Dijmin dora wî girtiye, da ku wî sax teslîm bigire. Rêheval Kendal naxwaze ku tu caran teslîm bibe. Lê mixabin tu derfet nemaye ku xwe ji nav destê dijmin xilas bike. Destê xwe davêje pîma Zilanî\* û dikişîne. Bedena xwe ya ciwan, fedayî jiyanekî bêdawî û nemir dike. Bi temenê xwe yê biçûk û dilê xwe yê mezin dijminê xwe li xwe diheyrîne.

Gotina Serbazê ku dibe şahîdê şehadeta wî ev bû: "Dê biserkevin. Binîhêrin li van xortan! Kî ji me dikare wekî wan bê-tirs canê xwe feda bike? Na! Na! Ne gengaz e ku ev doza wan neçe serî."

ADAR JİYAN



**DR. ZEKÎ TANRIKULU**  
(02.02.1958...)

## Ez şoreşger im

*Nema xof tene derê min  
in ji destxetên Kawa  
Ji xwe re dilek pola çekirîye  
Ew mirina reş;  
Vaye, min bi destê xwe daliqandiye  
li bahoza şoreşê liviyam  
Bi hilpişkîna serekî  
Ji atomê cergê xwe teqiyam  
Arê Newrozê me,  
di mirinê de jiyam im*

(Wê nikaribin berikan berdin pêşeroja me!)

Em di 5. salvegera şehadeta rêheval Dr. Zeki de, li ber bîranîna şehîdên azadiyê, bi rêz serê xwe ditewînin. Riya wan riya me ye.

**Hevala wî**  
**SELMA TANRIKULU**

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**



17.09.1982

**Ali Çiçek li Zindana Amedê di rojiya mirinê de jiyana xwe ji dest da**


Ali Çiçek di sala 1961'ê de li Hilwana girêdayî Rihayê lê dinê. Di xortaniya xwe de PKK'ê nas dîke û bi PKK'yîyan re tevî livbazîyan dibe. Ali Çiçek di nava PKK'ê de wekî "Stêrka Sor" tê binavkirin. Di dema destpêka 'Rojîya Mirinê' de ew jî bi M.Hayri Durmuş, Akif Yılmaz û Kemal Pir re tevî rojiya mirinê dibe. Di 17'ê rezbera 1982'an di rojiya mirinê de jiyana xwe ji dest da.

12.09.1982:

**M. Hayri Durmuş li Zindana Amedê di rojiya mirinê de jiyana xwe ji dest da**

M. Hayri Durmuş di sala 1955'an de li gundê Qumîkê ku girêdayî Depa Mezrayê ye ji davika xwe bû. Perwerdehiya xwe heta lîseyê li Çewlîkê û piştre jî Zanîngeha Hacetepeyê ya Enqerê dixwîne. M.Hayri Durmuş heta 1975'an diçe DDKD û ADYÖD'ê. Di vê demê de Serokê PKK'ê Abdullahî Öcalan nas dîke û tevî tekoşîna rizgariya Kurdistanê dibe. Di 1978'an de di avakirina PKK'ê de cih digire û ji bo Komîleya Navendî tê hilbijartin. Ew di 12'yê rezberê de li Zindana Amedê jiyana xwe ji dest dide.

**Mehmet Sincar hate bibîranîn**



**Ligel bîranîna Mehmet Sincar, şerawestîn jî hate silavkirin.**

Ji bo salvegera şehîdbûna Mebûsê Partiya Demokrasiyê (DEP) Mehmet Sincar, roja 4'ê rezbera 1998'an li HADEP'a Bağcîlarê ji aliyê Komîsyona Ciwanan û Komîsyona Jinan a Bajarê Stenbolê ve bîranînek hate lidarxistin.

Tevî Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik, Serokê HADEP'a Bajarê Stenbolê Mahmut Şakar û Sekreter Salih Yıldız, rêvebirên navçeyên Stenbolê, nêzî hezar kes tevî bîranînê bûn. Bîranîn bi axaftina Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar ve dest pê kir.

Di bîranînê de Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik da zanîn ku di dema pêşketina têkoşînê de ji bo ku gel bitirsînin hevalên wan qetil kirine. Osman Özçelik li ser Mehmet Sincar gotinên xwe wiha anîn zimên: "Mehmet, ferdekî fedakar û welatparêz ê Eşîreta Omerîyan bû. Li Amedê mamostetî kiribû. Mehmet hevalekî bêdeng bû lê bi biryar bû. Zêde xeber nedida, ku dikir."

Özçelik li ser rewşa wê demê jî wisa got: "Mehmet diçû Kurdistanê. Rêvebirên dewletê ji bo ku neçe herêmê ew tehdît dikirin. Gelek telefonên tehdîtî ji wî re kirin. Dû re Serok Komar di kursiya parlamentoyê de emwekî hedef nîşan da. Dîsa Çillerê jî wê demê digot em wan bavêjin." Özçelik axaftina xwe wiha berdewam kir: "Jixwe kuştina însenan ji zû de destpê kiribû. Êrîşên li ser partiya me bi hevalê me Mehmet dest pê nekiribûn. Bi şahadeta Vedat Aydın êrîşên li ser partiya me dest pêkiribûn."

Özçelik bi van gotinan axaftina xwe qedand: "Ji bo kuştinê Mehmet Sincar bi taybetî hilbijartin. Heta îro me bi hezaran şehîd dan. Ez di-

bêjim qey hindik partî hene ku ew qas şehîd dane û dîsa bi pêş dîkevin. Bi vê yekê ez karim bêjim ku du vê rîyê de wê serkeftinê hebe. Emê bi hevra dilanên serkeftinê bigirin."

Serokê HADEP'a Bajarê Stenbolê Mahmut Şakar jî li ser şahadeta Mehmet Sincar sekini. Wî wiha got: "Mantixa wan cîneyetan meriv dikare di du kategoriyan de binirxîne. Ji 1984'an heta 90'î dewletê taktîkên îmhakirinê bikar anî, mêze kir bi ser nakeve, ji 1990'î û şûn de jî taktîkên kont-gerilla bi kar anî û dest bi cîneyetan kir, heta gihîşt mebûsê DEP'ê Mehmet Sincar."


Her wiha Şakar li ser şer-rawestina PKK'ê jî dîtînen xwe anîn zimên. Şakar wisa got: "Dewlet di warê siyasî û aborî de êdî nikare birêve bê birin. Rêvebirina pergale daye bin destê nijdan (çeteyan). Nijdeyên ku li Kurdistanê ne kes wan rexne nake. Berxwedana kurdan zor daye pergale, ew aniye ber mirinê. Pergal ya wê bişkê ya wê bi pêş de gav biavêje."

Her wiha Şakar gotina Serokê HADEP'ê Murat Bozlak a "Emê aştiyê binin" bi bir xist û axaftina xwe wisa domand: "Di têkoşîna dinê de xwe daye der ku ew ên ku ne alîgirên aştiyê bin nikarin aştiyê binin." Şakar axaftina xwe wiha bi dawî anî: "Em alîgir in. Em agirbestê silav dikin, hurmet didinê û xwe wekî aliyekî aştiyê îlan dikin."

Bîranîn, bi xwendina helbestan, Konsera Koma Rohhilat û klamên Hozan Xanemîr bi dawî bû.

C. ANDOK/ STENBOL

**ÇAVDÊRÎ**



**Hevaltiya berdewam û bêxeyd**

MİRHEM YIĞIT

Di hin çirokên bav û kalan de behsa celebêk destbiratiyê dibe, destbiratiyê û hevaltiya bêxeyd, bêçiv, temendirêj û heta hetayê. Hevalên rê, kesên bi hev re dimeşin, ji bo saxlemî û berdewamiya hevaltiyê û ewlekariya wêbêva (pêşeroja) xwe, şertên wan hene, dar û bazareke wiha datînin: Xeyd tune. Aliyê bixeyde, ji nivê rê vegere, dev ji hevalê xwe berde, ji ser hevalê xwe bazde, bi tenê û di nav dijmanan de bihêle ceza dibe. Ew ji pêfî çerm e. Kesê peyman û lihevhatinan hevbeş nas neke, bazarê bin pê bike û bi rengêkî ji rengan raxerite, dagere, ji nav milên wî qatek çerm tê rakirin. Rewşa me kesên em li dora Înstîtuya Kurdî li Stokholmê kom bûne ji hinekî wiha ye, dişibe hevaltiya di hinek serpehati û çirokên kurdî de.

Em xebatkarên Înstîtuyê û rewşenbîr bûne pişka hev, sebir û hedana me bê hev nayê. Dualî em hewcedarên hev in û divê em ji hev re bibin alîkar, hevdû han bidin û bi pêş bixin. Pêvajo vê dixwaze, qenci û xêra giştî vê ferz dîke. Alternatîf û rîya baş ev e. Bi vî awayî em dê bigihên hedefê, em dê bibin xwediyên dezgeh û avahiyan neteweyî, Kurdistanî û tekûz. Tiradisyona xebata bi hev re ji dê wiha çêbibe û em dê wiha bi serkevin, bigihên mebest û meqsedên xwe. Wiha dê tovê toleransê zil bide, bize-qitîne, bi ser dora xwe keve û biseride. Têkiliyên nav me û rewşenbîran tim divê xurtir bibin. Em, "em û ew" dibêjin belê em yek in, du aliyên tevayiyekê ne û em giş divê ji her car bêhtir li hev bibaninin (xwedidêrketin) û baweriya me bi hev mezintir bibe.

Rast e car hene em hevdû rexne dikin, li ser kêmanî û sistiyên hev, ser-sarî û bêxemiyan hene radiwestin û erkên hev tînin bîra hev. Car jî hene, dibe şer di nav me de, em dilên hev dihêlin, xwe li hev gij dikin û dikevin pêxêrên hev. Belê xeyd tune, divê nemîne, xeyda çêdibe divê dirêj neke, wextî be, ji bo demeke kurt be. Divê ji wiha be û ne bi cureyekî din be. Lewre çî dibe çî diqewime ji bo xizmeteke baştir û ji bo geşkirina fikrên neteweyî û însanî ye, ji bo jiyaneke bi şuurtir û helwesteke biberpirsiyartir e. Di nav xebatê de em dibînin ku karê bi rewşenbîr û mirovên akademîk re bi serêş be ji pêwîst e, hêja ye. Ev kar bêhnfirehî û barbuhêriyê, hezkirina kar, dil û mêjiyên antremankirî, mirovên zû bi zû naşikin, nawestin, ne diltenik û dişûşe, belê dilxurt û xwedî biryar dixwaze. Û ev jî ne bi temamî û dever deverî be jî, ji diya xwe bûye, bi ser piyan ketiye û êdî rê nas dîke. Hejmarek kesên sabît û standart, tim li sînga xwe didin, xwe nadin vî alî û aliyê din, zanin bê ji bo neteweyekî înstîtu çêkekî çendî bi îsabet e, wê mîna çavên xwe diparêzin, hişê wan li ser pêşeroja wê ye, wext û enerjîya xwe didinê û amadeyê xizmetê ne, hene.

Înstîtu îro bûye navendek ku pir rê pê dikeve. Bûye cihê seminer, nîqaş û sohbetên bêrdar û bikelk. Nivîskar û hunermendên kurd hevdû li wir dibînin û li wir jî nêzik de di axaftin û guftûgoyên rûbirû de hevdû nas dikin, ji hev re fikir û dîtînen xwe dibêjin, pêşniyazên xwe dikin. Ev zemînek e, binaxe û pêşketinek e. Ji vir û ha de hêsantir gav dikarin bîn avêtin. Navendbûyîn û cazîbûyîna Înstîtuyê ji bo zana û xwedîqelemên kurd cesaretê dide mirov, fikra ku xebat vala naçe û heger israr hebe mûheqqê zû yan dereng berê xwe dide, li ba mirov diçespîne û dilê mirov bi xebatê xweştir dîke. Meha li pêşîya me angore roja 31.10.1998'an biryar heye ku Kongreya Înstîtuyê bê kirin. Bila ewil endamên me û piştre jî giş dostên hêja ji niha de agahdar û hayidar bin, bi hêvî û baweriya ku em dê Kongreyê vê carê bikin kongreyeke xurtir û serketitir û em dê hevaltiya berdewam û bêxeyd hinekî din firehtir û kûrtir bikin.

# Nivîskar û helbest

## Divê em bi rewşa

Berî her tiştî divê em bi nivîskarên xwe serbilind bin, ji ber tu dibistanên kurdî tune bûn. Her wiha bi ser de ji pirtûkên bi kurdî jî qedexe bûn. Gelek nivîskarên me hene, heta bîst saliya xwe hîn tipên kurdî nedîtibûn lê ev kes îro nivîskar in. Di vê rewşa kambax de jî rewşenbîr ji miletê me tîr der. Ma ev ne cihê serbilindiyê ye?

JANA SEYDA/ BAŞÛRÊ BIÇUK

*Emê ji meydana êşên toreyê dest pê bikin. Hûn dikarin rewşa toreyê kurdî li Başûrê Biçûk binin zimên?*

■ Çima em ji meydana xweşiyê dest pê nekin? Berî her tiştî divê em bi nivîskarên xwe serbilind bin, ji ber tu dibistanên kurdî tune bûn. Her wiha bi ser de ji pirtûkên bi kurdî jî qedexe bûn. Gelek nivîskarên me hene, heta bîst saliya xwe hîn tipên kurdî nedîtibûn lê ev kes îro nivîskar in. Di vê rewşa kambax de jî rewşenbîr ji miletê me tîr der. Ma ev ne cihê serbilindiyê ye?

Temenê min hijdeh salî bû, kovara rehmetiyê Cegerxwîn, Gulistan, ket destê min. Min digel xwe bir gund. Wê demê bavê min heftê salî bû, wê hingê tipên kurdî dîtî. Ji şênîyê gund gelek kes, ji bo ku tipên kurdî bibînin, bi şevê dihatin mala me. Hin kes jî dihatin tirs didan bavê min û digotin: "Vaye lawê te, wê belana ji we re bîne! Kovarên kurdî peyda dike." Bibliografya ku min di van heft salên dawî de li ser pirtûkên kurdî çêkirîye de diyar bû ku, li Sûriyeyê 71 pirtûk çap bûne. Dîsa li dora deh kovar û rojname jî bêtir destûra dewletê çap dibin. Ev ne karekî hindik e, cihê serbilindiyê ye.

Miletê kurd xwediyê şaristaniyeke dewlemend e. Nexwe gelê kurd nedikarî bédewlet, bi hezar salan zimanê xwe yê şêrin biparasta. Wekî mînak, vaye rewşa Cezayîrê li ber çavên me ye. Sed salan di bin destê Fransayê de ma, zimanê xwe wînda kir. Hem zimanê wan ê neteweyî û hem jî yê olî bû. Lê ev pêncî sal e ku, sed milyon ereb nikarin zimanê wan bi awayekî xweşik vegezin ser erebî. Ji ber vê yekê gava em miletê kurd bi wan miletan re bidin ber hev, bi çavekî mezin tê xuyan.

*Xuya ye tu kêfxweş î bi vê rewşa miletê me. Te tiştek ji meydana êşan ji me re negot?*

■ Min negot êşên me tune ne, lê hîn em negihîştine deriyê êşan. Mebesta min ji wan gotinên pêşîn ev e ku, em tim bi çavekî nizm li gelê xwe nenihêrin. Rast e êşên me jî gelek in. Wekî mînak, îro em du milyon kurd li Sûriyeyê ne, hîn tu sazgehên me yên çandî tune ne. Ew jî dîsa ji me ye. Ji ber ku partiyên me guh nedane vî karê pêwîst, hêz dane şer û pevçûnên hev. Di vî warî de guneh û kêmasiyên birjuwaziya kurd jî pir in. Ji ber ku ta ro-

ja îro birjuwaziya kurd tu carî pereyên xwe nekirine xizmetê sazgeheke çandî. Wekî em dibinin birjuwaziya kurd duri karê welatparêziyê ye. Îro partiyên kurd yên li Sûriyeyê û birjuwaziyê wan, bêkar û xebat li benda dewletê mane ku sazgehan ji wan re vekin. Bi nêrîna min ev xewn û xeyal in, divê em bi destê xwe bikin. Mînak, vaye pirtûkaxaneya min a biçûk, min vekir bêyî ku ez destûrê ji kesî bistînim. Carekê dudiyar û sisiyan lêdan û girtin ji min re çêkirin, lê di pişt re karin çî bikin? Yanê êşa me jî miletê me ye. Rehmetiyê Osman Sebrî digot: "Ger wê dît du meriv digirin hev, (şer dikin) du silan (şemaqan) bidin dev û rûyê yê di binî de û silakê jî bidin dev rûyê yê li ser." Îro ger silak ji dijmin re divê du sile ji me re divên. Ev kesên doza rizgariyê dikin û xwe li civatan vedinin, ne şerm e bi zimanê xwe nizanibin bixwînin û binivîsin! Ew kes ne derewan li xwe û li miletê xwe dikin? Bi deh hezaran ji me xwendina bilind bi serî kirine lê nizanin bi zimanê xwe bixwînin. Ev kesên hanê me dixin derya êşan ne meydana êşan. Lê divê em mafê nivîskarên xwe jî wînda nekin ku êşa miletê xwe hildidin li ser mi-

lên xwe.

*Bi dîtina te bejnên helbestî yên bilind di meydana helbesta kurdî de çêbûne?*

■ Bibliografyaya ku min çêkirî jî 41 pirtûkên helbestan ên bi zimanê erebî û kurdî hatine çapkirin, pêk dihat. Lê ew nabin dîwan. Em dikarin bêjin berhevok in. Di nava vê bibliografyayê de navê 35' kesan derbas dibe, ku helbest nivîsîne. Lê em nikarin bêjin ew tev helbestvan in. Her kes dikare navê hespê xwe bike Hedban lê her kes nikare bibe Dewrişê Ebdî.

*Wekî ku tu didî xuyakirin, ew ne helbestvan in?*

■ Ez nabêjim ne helbestvan in lê ez nabêjim ew tev helbestvan in jî. Gava di van salên dawî de rê kete kurdan, ku tiştên xwe yên nivîsandî çap bikin û biweşînin, kesên helbestvan û ne helbestvan berhevokên xwe dane çapê. Ji ber ku germbûneke milet bi ser kurdariyê de hebû. Lê ji vir û pê ve cihêbûnek wê di navbera yê helbestvan û ne helbestvan de çêbibe. Berê çî pirtûk bi kurdî dihatin weşandin miletê kurd lê dibezî. Lê a niha ne wek wê demê ye. Milet dikeve pirtûk-

xaneyan, li gorî dilê xwe pirtûkan dikire. Lewre gelek pirtûk jî bi ser nivîskaran de dimînin.

*Hûn bi xwe çawa li helbestên xwe dinêrin?*

■ Bi nêrîna min gava helbestvan bi helbestên xwe ne bawer be, nade ber çapê. Lê pêwîst e xwendevan jê razî bin. Berhevoka min a bi navê "Seyran Dil" her çiqas hin tiştên wê ne li gorî xwesteka min jî bûn, disa jî xwendevanên wê gelek jê razî bûn û rexnekar û nivîskari- ne mezin razibûna xwe li ser dabûn xuyakirin.

Gava ket nav destê mamoste Jan Dost, jî bajarê Kobaniyê tîl ji min re vekir û got: "Ger ez zanibim helbestek wekî helbesta te "Hevmala Min" bilind wê bi min re biderê, bila ez du salan hepis xew kim!" Dîsa dema helbestvan Nezir Palo ew helbest bihîst, ji min re got: "Te mafê du sal hepsê ji dewletê standiye."

Li aliyê din helbestvanê mezin Hemîd Bedirxan bo helbestên min got: "Min hîn nedîtiye di nav xortên kurdan de bi vê nazîkbûn û zelaliyê dinivîsinin." Nivîskarê mezin û xwediyê Kovara Kurd Name, li





# an Mihemed Hemo: xwe serbilind bin

## ★ HELBESTVAN M. HEMO

Di sala 1961'an de li gundê Şitika li navçeya Efrînê bi ber ronahiyê ketiye. Aniha jî li bajarê Helebê xwediyê Pirtûkxaneyê Bedirxanê. Lê ev pirtûkxane berî vê bi çend mehan jî aliyê dewleta Sûriyeyê ve hate girtin. Ji ber xizmetên wî yên jî çanda kurdî re, pir caran girtin û lêdan jî dest dewletê dîtine. Heya niha du pirtûkên M. Hemo wî çap bûne: "Civata Kulîlkan (şano)", "Seyrana Dil-Di Şîna Evinê de (helbest)". M. Hemo her wiha endam û xwediyê pêşniyara damezrandina Koma Xanî ya Wêje û Çanda Kurdî ye.

Libnanê helbestên min xwendibûn. Bêyî ew min nas bike, nameyek ji min re bi rê kir û gotibû: "Helbestên te bêdestûr derbasî dilan dibin." Nivîskar Necip Murad jî di Kovara Sorgul de sê rûpel derbarê helbesta min de nivîsandin. Her wiha Radyoya Dengê Emerîka programeke taybet li ser helbestên min pêşkêşkir û hin helbestên min xwendin. Dîsa jî dibêjim hin pir ji me re divê. Ez bi hêvî me hin rexnekar berhevoka min bidin ber rexneyan û kêmasiyên wê bidin xuyakirin.

**Di dîwana we de gelek helbest hene bala xwendevanan kişandin wekî "Hevmala Min" lê li rex wan helbestin lawaz jî hene. Ev cudahî ji ber çi pêk hatiye?**

■ Belê rast e. Di salên heştê de min helbest dinivîsîn lê tu carî nedihat bîra min, ez dê rojekê wan çap bikim. Li komaran me helbest dixwendin. Ji ber wê me li gorî miletê xwe dinivîsîn û miletê me pê kêfxweş dibû. Piştî vê yekê navê me bû helbestvan. Wê hingê em ketin bin barekî û em jî ber helbestên xwe bûn berpirsiyar. Ji bilî wê jî di nav salên nodî de em hatin girtin. Ev guhertin jî di jiyana mirov de bi roleke mezin radibe. Lewre di van salan de em bi berpirsiyarî helbestên xwe dihonin. Gava min xwest ez berhevoka xwe çap bikim, min nexwest wan helbestên kevin ên di beşa dawî de biximê. Lê hin hevalan jî min xwestin, ez

*Sergovenda xweşiya dil!  
Haya te jê heye  
Di van rojên mirdar de  
Ro li nivê ezmên  
dide xewê û qet  
danagere?*

*Dilê bengîn û bi evîn  
dipirpîte  
pelên xwînê lê dixîne  
co û sulavan diherikine  
natebite  
di cihên teng û genî de  
xwe lê dixîne dîwar û bana,  
dijîre*

helbestên kevin jî biximê. Ji ber ez bi wan helbestan nas bûm. Helbestên qels ên salên heştê ne û ên balkêş jî yên salên nodî ne. Lê hîna kêfa gelek kesan bi wan helbestên kevin tê. Lê haya min jê hebû, ku helbestên min yên kevin û yên nuh ne di tenga (sewiye) hev re ne. Lewre min berhevoka xwe kir du beş; kevin û nuh.

**Di sala 1994'an de we bi navê "Civata Kulîlkan" şanoyek çap kirî. Di sala 1995'an de xelata kurteçirokê ya Koma Xanî ya Wêje û Çanda Kurdî wergirtiye. Niha jî helbest, çima?**

■ Xebera te ye. Serpêhatiyên min di şano û kurteçirokê de jî hene. Gelek dostan jî min xwestine û şîret kirine, da ku ez çirokan binivîsim. Wekî nivîskar Necip Murad. Gava di sala 1994'an de ez beşdarî pêşbaziya kurteçirokê bûm, mamoste Azad Elî tîbîniyek li ser kurteçiroka min nivîsandibû. Divê xwediyê vê kurteçirokê roman binivîse.

**Ma tu tiştêkî wilo dinivîsî û ger tu nanivîsî çima?**

Bi nêrîna min çi çîrok, çi şano, çi roman wekî hêkan e. Dem jê re divê, ku meriv di ser de rûne ta can pê bine. Ew dem û valabûn jî bi me re tune ye. Ji ber wê em helbestan dirêsin. Lê di demên pêşîn de divê ez kurteçirokan binivîsim.

## HEVMALA MÎN

*Wek kevokê teqle  
Di ezmanê welat de  
Teqle teqle dizivire,  
basikan li hev dixîne  
xwe berdide  
Ser bajarê evîna min û te  
ji hêlîna bîraninan  
namê li ser namê  
Ji min re tîne  
û çare nîn e.  
Hevmala min!  
Kulîlka jîyanê!  
Li vî cihî*

**Hûn di tecrubeya hepsê re derbas bûn. Gelo tesîra zîndanê li nivîsandinê we bû. Ma pêwîst e ku yek têkeve tecrubeyek bi wî rengî hêla helbesteke bilind binivîse?**

■ Ger em li ser zîndanê û rola wê di nivîsandinê de bipeyivin, em dê pir dirêj bikin. Guhertina cih çî jî nivîskar re be, çî hunermendan re be roleke mezin dilîze. Ji ber vê yekê nivîskarên li zîndanê wekî yên derve naniivîsin. Te got tecrubeya te ya hepsê...! Tu carî navê hepsê li hepsa ku em tê de mane nakeve. Ji ber ku ew binerd bû. Me ronahî nedidit. Her xaniyek (hucra) 25 metre kare bû û li avrêjk û serşok jî di hundirê wê de bûn. Tu carî ne mumkun bû girtiyan hev du bidîtana. Pênûs, kaxez, rojname, radiyo, kevçî, kêr, agir, ev hemî qedexê bûn. Rewşenbîr, diz, qaçaxçî, efyonfiroş û kêş, siyasi

tev di nav hev de bûn. Yanê yên dikirin dewletê çêkin û dewletê wêran kin digel hev bûn. Bi şev û roj dengê qêrîn û nalînê di guhên me de hews vedida. Dilê gelek nivîskarên jî, wekî bi me mayî, ku min helbesta "Hevmala Min" di zîndanê de nivîsandî.

Li mihricana helbesta kurdî ya cara piştî, min ew helbest xwend. Hin helbestvanan gotin: "Ma em têkevin hepsê, em dê karibin helbestine wiha binivîsinin!" "Hevmala Min" bi xwe li ba min ne hel-

*Ehremen kenê xwe dike  
Ahramezda gazî û hawarên  
xwe dike.*

*.....  
Berê xwe didim  
çirûska çiya  
bi rê dikevîm  
Hepsê hêviyan,  
vedilukume,  
jê de dikevîm  
piştî min diderize  
dilê min ditevize  
vîna Apê Osman  
Piştî min rast dike  
Xwişka Leyla Zana.....*

best bû, wekî nameyekê jî hev mala min re bû. Bi rastî pênûs û kaxiz ji me re qedexê bû lê min ev helbest wekî nameyekê, bi tîla canê xwe, jî hev mala xwe re bi rêdikir. Lê piştî ku ez jî hepsê derketim, helbestvanê mezin Hamîd Bedirxan di nexweşxaneyê de bû, min serdana wî kir. Wî pîrsa dahûnanên (berhem) min ên li zîndanê kir. Li ser gotina wî, min jê re "Hevmala Min" xwend. Wê hingê Hamîd Bedirxan rabû li ser xwe rûnişt û got: "Ev helbest rast û durist e!" Min wiha lê vegeand: "Mamoste ev ne helbest e. Hin kar jê re divê" Ew vegeirî û got: "Çênabe ku tu tipekê jê kêm û zêde bikî, ev helbest jî hest û eşên rastî hatiye hûnadin." Wê hingê min dest tê neda.

**Bersiva te ji helbestvanan re çî bû, da ku karibin helbesteke wiha binivîsin?**

■ Ev jî helbestvan dimîne. Di zîndaneke wilo de, her mirov nikare li ber xwe bide. Zîndanên wiha, mêzin mîranî û mirovatiyê ye. Wekî mînak, hin xortên PKK'yî digel me hebûn. Serpêhatiyên wan kêmbûn, dîsa jî li ber xwe didan. Lê yekî serok û parlementer jî wan hebû. Ger diçû devereke bi hezaran kurd lê kom dibûn, ka wê çî bêje. Lê dema ew anîn ba me, bêyî lêdan û dijwarî jî ber hev ket, bi şemqan bi ser rûyê xwe diket û digot: "Ma ev der cihê min e?" Dema dengê îşkenceyê dihat diqêriya û digot: "Ma wê li min jî bidin!"

Her ku navê wî bang dikirin, em diketin bin piyan, ta me ew jî erdê radikir. Bûbû qeşmerê hepsiyan. Hepsiyên Erebb û yên din henekê xwe bi me dikirin digotin: "Parlementerên we ev bin! Ma hûnê karibin çî bikin?" Wê hingê me jî wan re berxwedana Leyla Zana mînak dianî. Her wiha vî kesê hanê her tiştê dizanî û bihîstî, jî mixeberatan re digot û dinivîsî. Ji ber wê ez dibêjim di zîndanên de mîrên ber mîzîne.

Bi nêrîna min zîndan jî yên wekî me re ne zor e. Ji ber ku me çavên xwe vekirine venekirine, me sînor di nav dil û cîgerên xwe de dîtine, bombe tiving û tîla sitirî di rûyê me de û zulm û zora zefikaran dîtine. Miletê kurd wê jî bo çî jî zîndanê bitirse?! Ji ber ku welatê me kirine zîndan. îro jî ber ku ez nivîskarekî kurd im, nahêlin nameyên min di riya postê re derbas bin. Dema ez nameyekê davêjim postê, roja din parstgehên dewletê min dixwazin û serêşiyê jî min re çê dikin.

**Berhemên we piştî "Seyrana Dil" çî hene?**

■ Dîsa helbest e. Di demek nêzik de wê berhevoka min bi navê "Di bin dîlovanîya jînê de" çap bibe.

*Helbestvanekî têr derbeder û kurdewarî:*

# Seydayê Keleş

Jiyana Seydayê Keleş yekser mijara filmekî tîne bîra mirov. Ev film, bi zarokatiyeke têr perîşan û belengaz dest pê dike. Her wiha di warê siyasî de jî helwesta wî balkêş e. Ew pêşîn perwerdehiya meletiyê dibîne peyre dibe endamê Hizba Komûnîst ya Sûriyeyê. Piştî dibe endamê Partiya Demokratiya Kurdî. Seydayê Keleş digel Cegerxwîn hevaltîyeke temendirêj dimeşîne û di bin tesîra wî de helbestan dirêse.

**D**i kemilîna wêjeya kurdî de, "seyda" cihekî girîng digirin. Bi saya wan û dîwanên wan zimanê kurdî û wêjeya kurdî ya gelêrî li hemberî wêjeya serdest kakûta xwe parastîye. Seyda bi kok û bintarên xwe, her çi qas di medreseyan de perwerde bûne û di bin kelîja (tesîr) zimanê erebî de mabin jî, zimanê kurdî bikar anîne û xwedî li zargotina kurdî derketine. Ji van seydayan yek jî Seydayê Keleş e. Niha dixwazim wî bi xwendevanan bidime nasîn, dû re çî kiriye, çî nivîsiye berbiçav bikim.

Jînenîgariya Seydayê Keleş, ji layê seydayê nemir Cegerxwîn ve wekî pêşgotinekê, di dîwana yekem a Seydayê Keleş a bi navê "Em û Dijmin" de hatiye nivîsandin.

Ristevanê me di sala 1930'yî de li gundê Bizgurê li Nisêbinê jî de û bavekî cotkar û belengaz, bêmal û zevî hatiye riwê cihanê. Navê wî yê rastîn Husenê Mihemed e. Kalikê wî (bavê diya wî) Mele Birahîm e û Keleş jî navê bapîrê wî ye. Dema Seydayê me heşt salî bûye (1938) bavê wî serê xwe daniye. Piştî mirina bavê wî bi salekê diya wî ji neçarî diçe mîrekî dike. Piştî vê bûyerê ap û pismamên wî ên bêdîn û îman, mal û qata wî li hev par ve kirine û Seydayê Keleş û xwişk û birayê wî, li ber dîwaran tazî û birçî hiştine.

Seyda bi xwe serpehatiya xwe nivîsandiye û tê xuyakirin gelek perîşanî û belengazî dîtiye û bi west û kêfaret xwişk û birayên xwe xwedî kirine. Tenê xalê wan sê sala ew xwedî kirine, lê zeviyên wan di ber xwedîkirina her sê salan de ji xwe re birîye. Piştî her sê salan cardin ji cem xwe derxistine û dîsa Seyda xwişk û birayên xwe li ber dîwaran bêxwedî mane. Piştî vê, çend salan bi nan û zîkê ji xelkê re xebitîne û xwe bi dijwarî û perîşanî xwedî kirine.

Paşê hatiye bîra Seyda, da ku bibe xwendevan û berê xwe daye Sûrî û daketîye gundê Xalit, cem Mele Abdulre-

zak û dest bi xwendina olî jî kiriye û li çend xwendegehên din jî xwendîye. Lê Seyda nas kiriye ku ev xwendina olperestî jî tu nanê bi rûmet û bêminet nade meriv, ji ber wê yekê dev ji xwendina olperest jî berdaye. Lê sebebê berdana wî dide xuyakirin, ku melayên kevneperest, dilê Seydayê me ji xwendinê sar kirine.

## Komonîstekî bi berdêl

Seydayê Keleş, berê xwe daye kar û keda helal û bêminet, xwe gihandiye Cegerxwîn û gelek bi ristên wî re mijûl bûye û di ber, berê paleyê û cot û şivaniyê re jî ketîye nav endamên hizbên komonîst, kar û xebata siyasî jî kiriye. Di sala 1951' de armanca wî ew bû, ku miletê xwe ji bin destê zor û zilmê derxe û şerê beg û axa û şexan bike. Di vê navberê de Seydayê me çûye xwişk û birayê xwe ji bakurê welêt aniye cem xwe û xwişka xwe ji xwe re daye bi jinekê bi berdêlî û Seydayê me bûye xwedî mal û zarok, ji nû ve barê giran ketîye ser milê wî. Lê Seyda dinêre ku karê li gundan tu pêşveçûn tê de nîn e, radibe berê xwe dide bajêr û mala xwe tîne Qamîşloyê. Lê Seyda bala xwe dide endamên hizbên ku ji bo dîroka kurdan sist in. Piştî demekê Seyda dev ji Hizba Komonîst digere û berê xwe dide nav rêza Partiya Demokratiya Kurdî û dadikeve nav miletê xwe, bi awayekî pêşverû di sala 1959'an de Seydayê Keleş di ber kar û xebata xwe de jî, dest bi avakirina risteyan jî dike. Seydayê me di demeke kurt te ristên (helbestên) heja ava kirine û pirê ristên wî li ser mirovayeti, welatperwerî, govend û şoreşgeriyê hatine ristîn.

Me li gorî pêşgotina ku Seydayê Cegerxwîn di dîwana wî ya yekem de nivîsandiye (1976), jînenîgariya Seydayê Keleş raber kir. Lê me hin gotin li gorî kurdiya îro sererast kirin, da ku xwendevanên me bi hêsanî fêhm bikin. Li gorî Seydayê Cegerxwîn, di nava ristên Seydayê Keleş de, serhevretî heye ango hin jê çêtir hatine avakirin. Ristên wî bi



awayê vetûrî (klasîk) hatine avakirin.

Dîwana Seydayê Keleş "Em û Dijmin" di 1986' an de li Stockholmê di nava Weşanên Roja Nû de weşiyaye. Seydayê Keleş di dîwana xwe de destnîşan dike ku dîwan bi şeş rengan afriye. Ew jî ev in: Rengê welatparêzî, rengê şoreşî, miletperwerî, rengê evindarê, rengê govendî û hûrizî, pestê sivik li ser bûka

Di dîwanê de bangeke Seyda heye û wiha dibêje: "Ez hêvîdar im ji miletê kurd, alî min bikin, min dehf bidin da ku hinek dîwanên din binim holê."

Ristevanê kurd di helbestên xwe de bi giranî ev mijar nîqaş kirine: Belengazî, nezanî, mîrxasî, evîn, bêbextî, xizanî û şiyarbûn.

Ji Melayê Cizîrî ta Seydayê Cegerxwîn di hemû dîwanên wan de, dengbêjan di kilamên xwe de, ji hozanê nemir Mihemed Şexo, Ciwan Haco û hin hunermendên kurd ên din jî di berhemên xwe de eynî tema bikar anîne. Ka em

çend nimûneyan ji van temayan ji dîwana Seydayê Keleş bigirin.

## DERDÊ ME GIRAN E

Derdê me giran e gelê kurda ji nezanî

Em mane li paş, kevn û rizî û tev xizanî

Ew hate serê me rebena tim perîşanî  
Ta mana li rasta bê xwedî û bi nezanî

.....

## NEZANÎ Û XIZANÎ

Here kurdo divê rabe bixwîne  
Ji bo êşa xiyaniyê nebîne  
Bes e her dem xizanî û nezanî  
Qelem bigire bi zarê xwe bixwîne

.....

## EM JI BÎR NAKIN

Bi kêr me nayên paldan û razan  
Divê hûn rabin xelkê Kurdistan  
Çima kurdê me, bînav û deng in  
Nebûn wek xelkê bêzar û xwendin.

AMADEKAR: FEREC BÛDIKÎ

Li Navenda Çanda Alternatîfê

● 12.09.98 şemî : Fîlm: Ceger Pola Derhêner: Mel Gibson saet:16:00

● 13.09.98 yekşem: Serbestî Sîr Platformî saet:15:00

Fîlm: Ceger Pola Derhêner: Mel Gibson saet:18:00

● 18.09.98 în Fîlm: Ceger Pola Derhêner: Mel Gibson saet:18:00

LI BERSAWÊ

● 13.09.98 yekşem:

Konserta Koma Agîrê Jivan, saet:14:00

## CALAKIYÊN HEFTEYÎ



LI NÇM'ya İzmirê

● 12.09.98 şemî: Konserta Koma Rojhilat saet:18:00

● 13.09.98 yekşem: Konserta Koma Rojhilat saet:18:00

● 16.09.98 çarşem: Panel: "Sazî û girîngiya wan" Beşdar: MKM, IHD,

HADEP, Ü.GÜNDEM

● 18.09.98 în: "Ji bo biranîna Apê Musa" panel, Amadekar: Înstîtûta

Kurdî, Beşdar: Hasan Kaya, Dicle Anter, F. Hîseyin Sağınç, Kerem Soylu

# Ji navendên çandan piştgiriya aştîyê

Koma Gulên  
Mezrabotan

Roja 6'ê rezberê li Navenda Çanda Alternatîfê ji aliyê navendên çandî yên welatparêz, demokrat û aştîxwaz ve çalakiyêke aştîyane hate lidarxistin. Di çalakiyê de daxuyaniya hevpar a Navenda Çanda Mezopotamya, Navenda Çanda Emek, Navenda Çanda Stran, Navenda Çanda Bulunmaz, Çağdaş Sanat Atölyesi, Navenda Çanda Alternatîf hate xwendin. Program ji aliyê xebatkarê BKM'ê ve hate vekirin. Wî di axaftina xwe de wiha got: "Ji bo ku em bêne cem hev, me gelekî hewl da, dawîya dawîn em hatin ba hev û me ev daxuyani amade kir." Naveroka daxuyaniya ku ji aliyê navendên çandan ên navborî ve hatiye amadekirin bi kurtahî wiha ye:

1'ê rezberê wekî Roja Aştîyê tê pirozkirin. Hemû mirovahî li hemberî şerên ku mirovahî û surîştê dirûxinin bi çalakiyan bertek û nefreta xwe tîne zimên.

Kes, sazî, rêxistin an jî dewlet li gorî rewş û berjewendiyên xwe şer û aştîyê didin nasin. Ligel ku herkes dibêje, "Em aştîyê dixwazin!" jî li ser rûyê cihanê şer didomin. Di heyamên şerên ku çînen serdest derdixin de, mirov bêtir har dibin û cîsnê xwe jî her aliyî ve qir dikin. Ev rewş di tu cureyên giyaneweran de tune.

Daxuyani wiha berdewam dike: "Tenê di Şerê Cihanê yê Yekemîn de 55 milyon mirovî jiyana xwe ji dest da. Bi giştî di tevahiya şeran de li dor 400 milyon mirov miriye. Niha vî agîrî welatê me jî serdanpê rapêçaye. Welatê me bûye warê windakirinan, mîrkujiyên kiryar nediyar û mîrkujiyên siyasî."

Di daxuyaniyê de di beşa li ser Kurdistanê de

wiha tê gotin: "Li Kurdistanê 4000 gund hatin valakirin, 40 hezar mirov di şer de hatin kuştin. Ji ber şewitandina daristanan her der bû çol û bejî. 3 milyon kes ji axa xwe, ji hilberinê hate dûrxistin, bi birçibûn û belengaziye re rû bi rû ma. Bi ser de jî welatê me bû navenda sereke ya bazirganiya tilyakê ya cihanê û pereyên kirêt."

Her wiha di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku ji bilî kurdan herkesî xwe li kerî û laliyê daniye û tu tişt bi xema wan nîn e. "Gelşa aştîyê gelşa sereke ya welatê me ye. Bi rengekî bi rûmet çareser kirina vê gelşê ne tenê karê kurdan e. Aştîyêke bi rûmet dê pêşîya demokratîkbûna Tirkiyeyê jî veke."

Di dawîya daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Bo aştîyêke bi rûmet divê dawî li Rewşa Awarîte, cerdevanî, JITEM, tîmên taybet bê. Asten-giyên li hemberî ziman û çanda kurdî jî navê bêne rakirin. Divê MGK, MÎT, Kontr-gerilla, rêxistina polîsan bête pelîşandin."


Piştî daxuyaniyê navendên çandî çalakiyên xwe pêşkêş kirin. Ji NÇM'ê Koma Gulên Mezrabotan bi stranên gelêrî û şoreşgerî girse çoşand. Gulên Mezrabotan bi kincên gelêrî û rengên neteweyî şahî xemiland û eleqeyêke mezin dît. Ji Navenda Çanda Emek, Şanoya Civata Hunerê ya Şükür Erşen bi listikeke balkêş beşdarî şahiyê bû. Di dawiyê de Navenda Çanda Stran danîşaneke DÎA'yê ya ku ji komkujîya Helepçeyê û komkujiyên din pêk dihat pêşkêş kir.

Ev çalakî bo piştgiriya tîkoşîna aştîyê û li hemberî êrişên dewletê yên li ser saziyan wekî bersîveke baş hate nirxandin

MEMED SERHEDÎ/ STENBOL

## TÎŞK

## Berew Mîhrecanî Şanoy Kurdî



SÎRWAN REHÎM

\* Akademiyay Kurdî le rojanî 18-20'î mangî 9'emî 1998 da, gewretirîn kernevalî şanoy kurdî û xoşiktirîn cejnî pêkgeyîştinî şanokaranî kurd le derewey welat çêdekat. Lem pêkgeyîştinî şanokaranî kurd da, heşt berhemî şanoyî û heft semînar derbarey şano le layen xemxor û sewdaseranî şanoy kurdî pêşkêş dekrên.

\* Diyar e hunermendanî kurd le derewe her le despêkewe be xoşewîstî germewe berew rûyî em hengawe çûn, her weha zorbey hunermendanî kurd be cîyawazî bir û boçûnewe piştgirî xoyan bo em mîhrecane be kirdewe be cê hêna, emeş ewe aşkira dekat ke hemû karekî hunerî û ferhengî ke le xizmetî mesele serekiyeke da bêt zorbe perowewe berew pîrî deçin.

\* Le katêk da ême pîrozbayî germ û desxoşkerî le Akademiyay Kurdî û ew kesane dekeyn ke le sazdanî em kare da rolyan heye. Her weha dawa le rageyandinî kurdîş dekeyn ke girîngî bem mîhrecane bidat û be şeweyekî şayan awirî lêbidatewe. Diyar e em dawaye le rageyandinî kurdî bo ewe ye ta kû ewaneşî ke tiwana amadebûnyan niye lem mîhrecane da bizanin şanoy kurdî çend berew pêş çuwe û çend hengawî girîngî nawe, be taybetîş le ser destî şanokaranî başûrî Kurdistan.

\* Ême le seretawe biryarman da ke be germî piştgirî le mîhrecaneke bikeyn û bo ew mebeste kewtîne xo amadekirdin û biryarman da be nawî Komeley Hunere Ciwanekanî Kurd Liqî Ewrûpa karî xoman pêşkêş bikeyn, hem bo em cejne gewreyey şano le derewe û hem diwatir le çend cêgayek bo kurdekanî niştêcêy derewe.

\* Ser dêrî berhemekey ême "Dûbarey Dastanêk" e, le amadekirdin û derhênanî nûserî em çend dêreye, ême lem karey xoman da sûdman le çiroke şîrêkî Şêrko Bêkes wergîtuwe ke pêştir heman babetî mêjûyî kirdiwe be baladêk. Diyar e ême le qalibêkî şanoyî da damanîştotewe û giyanêkî tirî be berda kirawe. Her weha sûd le beyt, stran, helperkê û mosîqay kurdî wergîrawe.

\* Lem kare da herdu hunermendî be tiwana Şadan Fuad û Şemalî Eberêş rolî serekî debînin û mosîqakeş le layen hunermend Hüseyin Rehberewe amade dekrêt. Cige lemes hunermend Soran Îsmail Yarîdey derhênan dakat û çîwar kiçe ruh sukî sewdaserî şanoş bo carî yekem le biwarî em karewe deçne bawêşî şanowe û çîwar rolî karîger debînin.

\* Be hiway ewey em mîhrecane le layen hunermendanî kurdewe wekî hengawî girîng pêşwazî lê bikrêt û be hîwayîşin sazkeranî mîhrecanekeş lem kareyan da bitwanin berdewam bin û her wa karî şayan be encam bigeyenin. Hêvî dekeyn rojanî 18-20.09.1998 sê rojî yekemîn cejnî şanoy kurdî le derewey welat le xo berceste biken û hunermendanî kurdîş be berhemî bedew ew cejne bikene çilçiray huner û dahênan...

# Li herêma Êlihê serpêhatiyek

**Q**uto, ji Êlihê bû. Ji Eşîra Reşkotan bû. Rojekê bûyerekek di nav wî û Eşîra Etmankî de derdikeve. Etmankî, li herêma Baykanê û Bedlîsê dijîn. Warê ku lê dimînin çiya û gelî ne. Debara xwe li ser karwanvaniyê dikin. Herdem bi hêstiran ji Bexdayî tiştê danîn û difirotin. Karwanvaniya wan li ser xwê be ji di nav de tiştên qaçax jî pê re difirotin.

Rojekê Quto û karwanê mala Eliyê Etman li hev nakin û li hev û du dixin. Quto tê kuştin. Lê belê lawekî quto heye, navê wî Filît e. Filît, zaro ye û pîreka Quto, dayika Filît navê wê Şemê ye. Du heb qîzên Quto hene. Navê yekê

## Filîtê Quto

(1)



Xoxê ye û navê yekê Eynê ye. Filît mezin dibe ji Eşîra Pencînarya bi dergistî dibe. Lê belê Quto Reşkoti ye. Şemê jî ji Eşîra Elika ye. Ev hersê eşîr jî di herêma Êlihê de ne. Sê eşîrên qerebalix û asê ne. Filît jî xortekî pir jêhatî ye û mîrxas e. Di nava eşîrên Reşkotan û Pencînarya û Elikan de nav û deng daye. Rojekê ew û hinek xortên Pencînarya li hev du dixin û xortên Pencînarya jê re dibên tu pir mîrxas î here heyfa bavê xwe hilîne. Filît tê malê. Ji diya xwe re dibêje:

– Dayikê, ka te ji min re digot “bavê te bi emrê xwedê miriye” Te ji min re nedigot, lê îro xortên Pencînarya ji min re gotin “bavê te Etmaneka kuştiye” û ji diya xwe re diqehire. Diya wî jê re digot:

– Belê lawê min bavê te karwanê Etmaneka kuştin. Lê belê min digot ez ji kurê xwe re nabêjim. Kurê min eve ku tu pê hisiyayî, min digot bira tu pê nehîsî. Serê lawê min nekeve belayê. Min digot “Bira lawê min bi rehetî bizewice û dergistîya xwe bîne.”

Filît ji dayika xwe Şemê re dibêje:

– Çawa ez ewqas mîrxas bim û xelk bavê min bikuje û heyfa bavê min li erdê bimîne..

Di wê demê de Mamê Eliyê Etman dihere nav eşîra Pencînarya. Dergistîya Filît jî ku wî dibîne jê re dibêje.

– Tu diherî Şam û Bexdayê. Tê ji min re bîni kil û kildankên Bexdayê.

Yekî fesad ku vê gotinê dibihîze tê xwe digihîne Filît û jê re dibêje: Dergistîya te îro temiya kil û kildanka da bû mamê Eliyê Etmên. Eliyê Etmên jî xortekî gelek bi aqil û pak û bedew bû. Ji wê yekê, sermiyantiya karwan di destê wî de bû. Di nava karwan de zilamên heftê-heştê salî jî hebûn. Sermiyandarî dabûn destê Eliyê Etman. Filît dilê wî xerab dibe. Dibêje:

– Bavê wî bavê min kuştiye û ew jî bi dergistîya min re dirêse. Çavê wî lê ye dergistîya min ji ber min bigire.

Filît diqehire dikeve pevçûna karwanê mala mamê Elî. Rojekê dibihîze karwanê Mala Mamê Elî dike bê, di Pira Êlihê re derbas dibe. Filît gazî dayika

xwe Şemê dike dibê:

Dayê tu yê du denga bi gazî ke û yekî bi hewarke li xoxê û Eynê ye. Bira ji min re derxe bozê (navê hespê) derxe ji tewlê yo. Zîne Entabî bavê ser piştê wê yo. Bi galgalê gotinbêja tiştên xelk dibên Mala Mamê Elî tèn ji karê xwe yo. Ezê xwe bidim ser Pira Batmanê ezê ji karwanê Mala Mamê Elî bistînim bacarê yo.

Şemê bi aqil e û Mala Mamê Elî jî baş nas dike. Zane ku kurê wê ji mala Mamê Elî tu bacarê nastîne. Mala Mamê Elî jî zana ne û mîrxas in. Tu carî teslîmî kesî nabin û bertîlan nadin kesî Şemê bang kurê xwe dike dibê:

– Filîtê mino lawo neçe. Heger ku tu diherî çend peyayên mala Hesankorê û Elikan û Pencînarya bibe bi xwe re.

Filît li xwe danayne û bi tenê li bozê siwar dibe. Dihere ser Pira Batmanê. Li pêşiya karwanê mala mamê Elî disekine. Û dayika wî dîsa bang dikê dibê:

– Filîtê mino lawo ezê bi tapiya bavê Biro Dara Sloqasim ketim va bi rêyo. Mala Mamê Elî berê ji hevalên

xwe distînin riya mala xwedê ye. Û dawiyê lê dixê û bi destê wan ve têyo. Tirsê min ji wê tirsê ye, mala mamê Elî berxê min jî bişîne di oxira bavê yo. Were vegere ji vê fikrê yo.

Îcar Filît bang dayika xwe dike:

– Şemê dayê dilê min dibêyo. Ezê bi tapiya bavê Biro Dara Siloqasim pozê milinderê Kanîka Badîreşê û Kevanê Qîrê ketim wa bi gira. Ezê xwe bidim ser Pira Batmanê nola gura. Ezê karwan li mala Mamê Elî peya bikim nola bira. Ezê gelek karwanê mala Mamê Elî bi xwe re binim werim vira û ezê gelek belgîr û hêstirê mala mamê Elî bi xwe re binim werim vira. Teyê bivê “Filîtê mino, lawo xwezî sê ro berê te ev karê xwe bikira” û ezê ji mala Mamê Elî bistînim heyfa bavê yo.

Îcar dayika wî Şemê bang dikê:

– Filîtê mino lawo dilê min dibêyo. Ezê bi tapiya bavê bira Dara Siloqasim ketim li van gira. Ez zanîm berxê min tu karwanî ji mala mamê Elî nastîne û nayne vira.

Filît bang diya xwe dike:

– Şemê dayê dilê min dibêyo. Ezê xwe bidim ser Pira Batmanê nola gura. Ezê karwanê mala Mamê Elî li telefantê xim li wira.

Û Şemê dîsa bang lawikê xwe dike:

– Filîtê mino, lawo karwançiyoy. Xelk dibên mala Mamê Elî tèn ji kara xwê yo. Ez bi ehedê wehed dikim, di nava vî karwanê mala Mamê Elî de barê deh belgîr û hêstirên wan ne xwêyo. Barê wan tev cebîlxane û tev guleyo û di mala mamê Elî de barê deh belgîr û hêstirên wan ne xwêyo. Û mala mamê Elî ji bav û kalan de ji me zêde yo. Berê ji hevalê xwe distîne riya mala Xwedê û dawiyê lê dixê û bi destê wan ve têyo.

Di nav wî karwanî de yekî ne ji Etmaneka şîrikê wî karwanî ye û ew jî wê seferê bi karwan re ye. Navê wî jî Memê Celîkî ye. Celîkî jî Eşîrek e. Mamê Elî wê şevê di xewna xwe de dibên. Bala xwe didê li ser Pira Batmanê reşek sekiniye û ew dike nake nikarin wî ji ser rê derxînin. Nayê kuştin jî û lê dimînin heyirî. Mamê Elî bang Mamê Celîkî dike dibê:

– Şîrîko min xewnek dîtibû û ji xewna nivê şevê yo. Rica min heye ji te û xaliqê alemê yo. Heger îro kî hat pêşiya karwan ji feqîran, ji cêbkesana, ji mehkûman û ji qaçaxçiya kî hat çî da kê, wexta ku em vegeriyên malê ku me hesabê xwe kir bira ji kîsê me here. Bes ku destê me û kesî bira nekeve pêxîla hev û dun. Û em bi selamet vî karwanê xwe bigihînin malê. Çavên erz û eyalên me hu çelix û çocixên me li riya me yeye. Ê Celîkî peyva Mamê Elî dipejîrîne û riya xwe berdeyam dikin û tene ser Pira Batmanê. Mamê Elî li pêşiya karwan e û mamê Celîkî li dawiya karwan e.

SEYDO BAŞÇI-MEHDÎ

Kaseta Koma Gulên Xerzan a nû:

## Sonda Me



“Çanda me ya dewlemend ku ji sed salan e ji aliyê pergalen serdest ve tê talankirin, tê xwestin ji kakilê xwe bê pûçkirin, bi piştaftin û rûxandinê re rû bi rû maye, bi evîna gelê me ya azadiyê ve ji nû ve bûye yek. Di vê pêvajoyê de, bi coşiyê bêbinî û bi renceke bêdawi nixên çandî yên mezin hatine afirandin. Her çilkeke wê bedewî ye. Û pir hêja ye. Ev pêvajoya, di heman demê de bezeke ku bêhna mirov diçikîne ye. Afirandina pêşerojê ye. Wek Dicleyê evindar.....Wek

Mûznûrê bi hêrs e! Wek Zapê dîrokî...

Bi vî awayî, em jî li destkeftinan serzêdeyîyekê dikin, xebata xwe ya duyemîn SONDA ME diyarî gelê xwe dikin.” (Bergnameya kaseta “Sonda Me”)

Yek ji komên Navenda Çanda Mezopotamyayê Koma Gulên Xerzan, piştî kaseta xwe ya bi navê “Ji Bîr Nabin” a niha jî bi kaseta xwe ya bi navê “Sonda Me” derket pêşberî muzikhezan. Kaset ji aliyê Kom Mûzîk Yapım ve hatiyê çekirin. Di vê kasetê de tiştê herî balkêş, giraniya motîfên muzîka nûjen û rojavayî ye. Kom di vê şewaza xwe ya nû de serketî ye. Wekî diyar e, kaseta yekem a komê bêhtir bi motîfên kurdewarî û rojhilatî hatibû çekirin. “Sonda Me” jî deh helbestan pêk hatiyê. Ji wan 3 heb gelêrî ne, yê din jî muzîk û gotina wan hinek jê yê endamên Koma Gulên Xerzanin, hinek jî girtîgehê hatine.

Ev kaseta Koma Gulên Xerzan li gorî kaseta komê ya yekemîn hîn bêhtir bi aheng û xweş e. Di hin kasetan de helbestin jê mîna lokomotîf in. Ji bo Koma Gulên Xerzan jî em dikarin bibêjin stranên “Darê” û “Partîzan” bi awaz û nave-roka xwe derdikevin pêş.

Di kasetê de amûrên; bas gîtar, mey, zirne, dahol, erbane, perkisyon, keybord, elektro, akustîk, kilaşîk gîtar, baxlama, bilûr, qanûn hatiyê bikaranîn.

SERWÎSA ÇANDÊ

Dengê Elewiyên Kurdistanê:

## Zülfikar

Hejmara 25. ya kovara Zülfikarê derket. Wekî tê zanîn Kovara Zülfikar demekê li Kurdistanê û Tirkiyeyê hatibû belavkirin. Peyre der barê kovarê de doza girtinê hatibû vekirin û li Gerinendeyê Giştî yê kovarê Hüseyin Karataş cezayê hepsê hatibû birin. Karataş niha di Girtîgeha Paşakapısı ya Üsküdarê de cezayê xwe dibe serî. Zülfikar ev demekê li Almanyayê tê çapkirin. Di nivîsa yekemîn a kovarê de li ser Raperîna 15'ê Gelawêjê hatiyê rawestûn û wiha tê gotin: “Kesê ku Raperîna 15'ê Gelawêjê fêm neke, wateyekê nedê, nikare rastiya kurd û Kurdistanê jî fêm bike.” Wekî din li ser çalakîya “Peymana Lozanê ya Alternatîf” ku li Lozanê pêk hatibû, tê rawestandî.

Hevpeyvîna ku bi Serokê Federasyona Elewiyên Kurdistanê İmam Canelpolat re hatiyê kirin, bi naveroka xwe balkêş e. Sernavê vê hevpeyvînê wiha ye: “Dewletê tu çaran hez ji elewiyên nekiriye û ne xema wê ye jî.” Di vê hevpeyvînê de listikên ku dewleta tirk li ser Şahiya Hacı Bektaşî Veli dilîze, tîrî vegotin û ev mesajê ragihandin: “Divê em Hacı Bektaşî Veli ji destên dewletê yê bi xwîn, bifitilîn!”

Kurdên elewî ku pîranî jî derdora Dêrsim, Gurgum, Meletî û Erzînganê ne, demekê dirêj digotin û kêmbin jî hê dibêjin “Em ji tirkên Xorasanê ne”.



Nivîsa Haydar Işık li dijî dîtînen bi vî rengî, agahiyên di cih de dide mirov.

Wekî din jî di vê hejmara Zülfikarê de ev nivîs hatine weşandin: Elîşer û Zerîfe Evîn Aydar, Bandora 15'ê Gelawêjê Li Ser Gelên Rojhilata Navîn û Bîr û Bawerîya Wan Rıza Fîrat, Li Ser Rastiya Dîroka Elewiyên Hüseyin Eylemi, Jiyana Elewiyên; Süleyman Oktay, danasîna pirtûka “Bingehe Felsefî ya Qizilbaşîyan” Zeynep Aydın û hin mijar û nivîsên cur bi cur di kovarê de cih digirin

SERWÎSA ÇANDÊ

## Agirbestê barê me girantir kir

HASAN KAYA



Berîya ku Serokê Giştî yê PKK ê Abdullah Öcalan agirbestê ragihîne, Televîzyona Medê hefteyekê li ser hev danasîna bernameya tele-konferansê kir. Heftetek beriya agirbestê, şîrove, guftûgo û niqaşên der barê wê de dest pêkirin. Jî xwe di wan rojan de, em jî wekî heyetekê, diçûne serdana hinek kesên rewşenbîr û hinek saziyan. Pîraniya wan kes û saziyên ku ne ji derdorên kurdan bûn. Em jî bo ku xebat û berhemên Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi wan bidin nasîn, fikir û ramana wan bistînin û ji bo ku em wan vexwînin bîranîna Apê Mûsa ya ku em ê di 19'ê wê mehê de, li dar bixin diçûne serdanê.

Her cihê ku em lê rûdiniştin, piştî lihevpirsîna, “hûn çawa nin, hûn baş in” ê û sedemê diyarkirina serdanê, gotin diçû û dihat ser agirbestê. Wan mirovên ku a niha di rojnameyên cihê de, nivîskariyê dikin, ji me bêhtir, biryarên ku di tele-konferansê de wê bêne gotin meroq dikirin. Her kesî xem û gumanên xwe vedigot. Di nav gumanan de, biryara dayîna agirbestê jî dibuhurî. Dema

ku wan kesan peyva agirbestê dibihîstî jî nişkê ve dicoşîn, tama sohbetê xwestîr dibû. Nedixwestin ku em rabin, dahûrandîna xwe dorfireh dikirin û raya me dipirsîn.

Di wan serdanan de me mijarek jî yê bêhtir rave kir. Divê ku mirov tîkiliya xwe kûrtir bike, bi derûdorên derveyî me re. Lewre her ku mirov tîkiliyên mirovî, dostanî xurt dîke, pîra di navbera mirovan de tîkûztir dibe, hevdu tîgihîştin çêtir dibe.

Piştî agirbestê ez li gorî xwe gihîştîm hinek encaman. Her kes dizane ku piştî eşkerekirina biryara agirbestê, barê me hemûyan girantir bû. Bêhtir jî barê wan ên ku li derveyî welêt dijîn. Vê dewletê 72 hîleyên meşhûr jî xwe re kirine rêz û rêçik. Pirtûka wê ya pîroz jî derew, kompo, listikên kontîngerîlayî yê ku ji Pentagonê emanet standine, ev hemû dek û dolap di yek pirtûkê de berhev kirine. Li gorî vê pirtûkê karê xwe dimeşîne. Di wê pirtûkê de haveynê wijdan û dilovaniyê nîn e. Ji ber vê mizawîrbûna dewletê, gelê wê yê hejar û bilateşbîh, mirov dikare bibêje bûye mîna “kerşeytan” ango xwe jîr dihesibîne, lê pir nezan û xewar e. Li ser her yek jî me, ferz e ku em mirovekî ne kurd, der heqê doza Kurdistanê de, hişyar, zana û serwest bikin. Bêguman ev karekî pir dijwar e. Şerê taybet mirov ew qasî xerakirine ku, ji bo şuştîne sabûn û av tîrê nakê, lê ne xem e. Sebr û aram jî me re divê. Ji bo dozê, ji bo xatîrê hemû mirovahiyê pêwîst e ku em debar

bikin li hemberî eş û eleman.

Agirbestê karê me hêsantir kir, gelek derî bê astengî jî me re vekirin. Cesaretekî mezin da welatparêz, ronakbîr, şoreşgerên kurd û tirkên. Divê ku em bi kêr werin, di wan derîyan re tîkevin hundir. Têkoşîna azadiyê xwediyê bîngeheke estetîk e. Ango tîkoşîn hemû karê xwe bi awayekî estetîkî bi rê ve dibe. Dema ku em bixwazîna doza xwe ji mirovahiyê re bibêjin, zîmanekî lihevhatî, estetîk jê re divê. Bi vê bawerîyê em dikarin dengê hêstîrên dayikan, bêhna dengê xwînê, girîna xwînê, girîna pêt, hestî û rezên sotî bidin ber bêvîla hêşînayîparêzekî. Qirkirina ax û daristanan em dikarin bibîne guhê keşîşekî, em dikarin bigihêjin dîwarê dêrekê, mizgeftêkê, sînogokê. Ev qîr dikarin çavekî miçkîrî, yê bijîşkekî tirk vebikin.

Di nivîsareke xwe ya din de, ezê bixwazîm ku li ser hewcedariya belge û dokumanên derheqê gelê kurd de binivîsim. Lewre çawa ku dibêjin hişê gelek mirovan di çavên wan de ye. Gelo, me çi qasî kariyê, diwarbûna şer bixin belge. Ji devê şikestî û mexdûrekî şer du heb gotin fotoyekî biçûk bi xwe jî, ji bo mehkemeyên pêşerojê, ji bo wijdanê mirovahiyê gelek pêwîst e. Ku mirov pêvajoya agirbestê bi van belge û dokumanan bixemilîne dê karê me hêsantir bibe.

# Şerê belavkarekî

**B**elavkarên Azadiya Welat ên Amedê du heb hevalên biçûk bûn. Belavkarek her gav rojnameyê digire û ji bo firotinê derdikeve derve. Ji deher heb rojnameyên xwe heşt heban di demeke kin de difroşe û bi du heb rojnameyên xwe yê mayî diçe Çayxaneyê Esmâ Ocak. Bi gelemperî kesên ku ji xwê re dibêjin çepgir li vir rûdinin. Lê di wê kafeyê de serbazên dewleta terk jî hene. Belavkarê rojnameyê gava digihîje hundur mêze dike çend zarok li ser maseyekê rûniştine, bi hestên zaroktiya xwe ew jî diçe licem wan rûdine û guh dide wan. Zarokên ku li ser maseyê di nav xwe de diaxivin:

- Gava tu mezin bibî tu yê bibî çî?
- Ez dê bibim bijîşk (doktor)
- Ez dê bibim polis
- Ez dê ji bibim tîm.

Gava jî wan zarokêk dibêje, ez dê bibim tîm êdî belavkar xwe nagire û hema rojnameyên ku di destê wî de mane datîne erdê û li zarok dixê û wî baş dikute. Belavkarê rojnameyê her ku li zarok dide dibê: Ezê li diya te çî bikim. Tu yê bibî tîm ha! Berêva lê dide û berêva dibê ezê diya we n.... Baş zarokên serbazan dikute û vedigere şaxa rojnameyê.

- Hevalê berpirs dipirse:
- Heval te çawa kir, rojnameyên te xelas bûn.
  - Belê heval.
  - Wê çaxê ka pereyên wan.
  - Wele heval min heşt heb firotin, du heb nefirotin
  - Du hebên din te çî kirin?

Belavkar serpehatiya xwe ji hevalê berpirs re dibêje. Hevalê berpirs dipirse dibêje:

- Te ew kutan, te gelek baş kir, lê te çima rojnameyên xwe li wir hiştin?
- Hevalê belavkar, dibe ku ji tirsê jî rojnameyên xwe li wir hiştibe, lê bi xî awayî bersivê dide:
- Heval min ew kutandin û rojname

li wir danîn ku bila bizanibin ev çalaki jî hêla Azadiya Welat hatiye kirin. Lê gava yek livbaziye dike, belavokekê li wir nahêle?"

BERHEVKAR: CEMAL ÇEMAN

## Şorbenîska bi pirç


Rojekê yekî Cilîni tevî zarokên xwe û pîreka xwe li mal rûdine dê şorbanîskê bixwin. Dinîhêrin ku mişkek ji quncikê malê jî nava firaqa pekiya hat, xwe avêt nava şorbê. Pîrek hêdika rahişte qemçika mişk, mişk ji nava şorbê avêt û bi kevçî şorbe li hev xist û got: "Hey zarokno de bixwin."

Zilam got: "Heyra nayê xwarin purta mişk weşiyaye."

Jina wî dibê: "Tîşteke nabe. Ew dê çî bibe lo?"

Zilam jî bi medetirşî, sihana şorbenîskê dibe dixê cîherê kerê. Şorbe kelandî bû. Devê kerê jî di cîher de bû. Ji nişka ve kerê jî serê xwe bilind kir, çavê wê belok bûne, bihêrs dibêje. "Ez ji naxwim, ez ji naxwim, ez ji naxwim."

MEHDÎ BAXÇA



### BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (137) XAÇEPIRSA

Bi sorani isal	Resen Buse, dafik	Heremek Kurdistan a basur	Vegetandeki	Naveki mîran
Wêne		Mezel		
Dengdêre n Mine				
4				
Rengek			Cihê ku roj lê nade berepaşki îrade	
Elok				
		Ava firaqan Rengêk		Bi kirdki here
Bi kirdki Za Fakulte		Dengdêre n 'sa'ê Naverok. îha	Jere not Bere	2
1			.....Keskin (Cigra serokê îHD'ê)	Tebîni Li duv duayê te gotin
				3
Sembola Amerikayî me	Cih. qad Din			
Bi kirdki ciya berepaşki Al		Bi kirdki Kêm Cînavkeki pêrbestî		
Naveke jinan			Tipa du l'ye	
Esîr		Serokê şoreşa sovyetê		

#### Bersiva Xaçepirsa 135'an


Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, em dê wan binixînin û bi riva pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 137'an Kasetê Koma Gulên Xerzan a "Sonda Me" ye

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nixxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe jî me re bişînin.



Pênc kesên ku pirtûka Enstîtûya Kurdî 'Çirokên Gelêrî' qezenc kirine ev in: Gökân İner/ İzmîr, Hanîfî Polat/Agîrî, Hasan Köylüoğlu/Mêrsîn, Eyüp İke/Êlih, Ömer Vesek/Muğla

PEYVA VEŞARÎ



# Polîsê bêvardayin viraştin teva nêzanê

Tevera qeçek, cenî, camêrd pîr mevajê jopana ciresê. Polîsanê peydê keverî û sînamaya tirka biwazê şarî bixapeynê. Şaro şima rind silasneno. Êkê şima nêsilasnayê jî pîrozkerdinê şimayê rojê aşfî ra şima silasnayê.


Vêri her vardayinan pey ra, îmaj û perwerdehiya polîsan ser ro, vindêriyayê. Her vardayin pey ra jî serdarê dewlet vatê, mayê dersa haqê mardiman, tewrê perwerdehiya polîsan kimi û na raya, na mesel ver kewimî. La belê, nê vardayinê peyinê ke mayanê şemî û aşfîwazan rê virazyayan ra aysê (vînya) ke serdarê dewleta tirk verê na mesel senî giroto. Rastî jî dersa haqê mardiman tewrê perwerdehi kerdê û haqê mardiman senî (çitor) îhlal benê, rind û weş mûsnawa polîsan.

Ze ke yeno zanayin, polîsî 15'ê gelewêj ra nakîş mayanê Şemî rê vardayin virazenê û her hefte xeylê mayê şemî û destegdayoxê ci genê binçim. Hem nê, zey verinan jî niyê. Cenî, camêrd, qeçek (doman) pîr nêvanê, jopana resanê ci û pîrodayina genê binçim. Çend seatî binçim de ternay û pey ra viraday. Heftewo ke ravêrd de mayê şemî û destegdayoxê ci çehar rojî binçim de ternay, bado viraday. Viradayin pey ra înan wast polîsan û fermanaranê polîsan gere bikerê, coka jî Adliyeya Beyoğlu verd de amey pêser, gere bikerê. La belê polîsan fina ci rê vardayin virast û nêvirada ê haqtê gerekêrdin de eşkerakerdina xo bikerê, zorna(reyna) kerdî vila. Heftewo didin tewrbixox û destegdayoxê mayê şemî vêşbiyayin ser, polîsan vardayin rast ra rast nêvirast. La belê êkê qandê destegdayin wastbi bêre wija, rayde 27 kesî girotî binçim. 31'ê menga gelawêj û 1'ê menga rezber (rojê aşfî) de jî, zey mayanê şemî, aşfîwazan rê vardayin virazyay. Ez bawer kena şima nê vardayinî televîzyonan ra temaşe kerdî û şima jî ê riye çermûqayey çimanê bi xo dî. Biyarê xo vîr a seat kesî nêwastê bewno ridê

ê vardayoxan, bi taybetî jî fermanaranê înan. Çimki ê ridê çermûqayey ra şerwastin û dişmenîna aşfî û birayina şaran wanyayê.

Wext wext, ca ca, ma înana yemi pêver. O çax polîsîn ser ke qal abiyena, xo hend rind danê silasnayin ke, kes ke rastiya înan mesilasno û seata vardayin de o riyo çermûqayewo ke, televîzyon de vînyayê (aysayê), meyro kesî vîrî, vano nê polîsî ya melek ê, yan jî manayeyê melekan ê û hemfikirê to yê.

Ezo wazena tiya mesela ke emniyetê Stenbolî de vejyawa heyeta HADEP ver ay biyarî ziwana. Heyeta HADEP qandê (serva) tevera pîrozkerdina Newrozê ser ra 1997 destûr wastin, emniyetê Stenbolî ziyaret kena. Heyeta HADEP wexto ke şina odayê serokê Emniyetî ewnena (vînenê) waliyo jî wija. Coka heyet hem walî û hem jî serokê emniyetiya pêdiyî virazena. Wextê weriştin yeno, jew cagenoyê (cigirê) serokê emniyetî şino zere, walî û serokê emniyetî ra vano: "Ezo wazena heyeta heveyê, taybetî qisey bikerî", vano û heyet beno odedê xo. Rojê




wê peynî ser ro, fikranê xo ano ziwana; heyeta HADEP ewnena vînayinê ey, zey înanê, ê jî ey ra pers kenê: "Emniyetî miyan de zewbî kesê ke, zey to fikir yene estê?". O jî vano: "Hema hema hemû cagenoyê serokê emniyetê Stenbolî û serokê emniyetê qazayanê Stenbolî zey mî fikir yene". Na vaten ser jî heyeta HADEP vana: "O çax ti û embazê to yê ke, zey to fikir yene, nê fikranê xo binûsê, eşkeraya raya giştî bikerê, keverê HADEP hetanî peynî şima rê akerde wo". Heyet senî ke wina vana wextê karê ci ameyin bahane keno û dano piro şino. Yanê namedo bîna heyet qewneno. Ze ke mi cord jî ard ziwana, serokê polîsan fikranê winaynînan keveran pey de, tim û tim anê ziwana. La belê teveran de jî bêvardayinan teva nêkenê û jopana resenê aşfîwazan. Şar o notê polîsanê peydê keverî ra û sînamaya tirk ra nêdano. Tevera qeçek, cenî, camêrd pîr mevajê jopana ciresê. Polîsanê peydê keverî û sînamaya tirka biwazê şarî bixapeynê. Şaro şima rind silasneno. Êkê şima nêsilasnayê jî pîrozkerdinê şimayê rojê aşfî ra şima silasnayê. Rojê jû cenyek qandê (seba) polîsan wina vatibi. Polîsê, bêvardayin teva nêzanê.

MEMED DREWŞ

## KIŞTOXÎ HEME CA AMEY LAHNETKERDIN

Mebûsê DEP Mehmet Sincar Msera kiştina panjîn de Kurdistan û metropolanê Turkiye de ame vîranîn. Ze ke yeno zanayin, heyeta Partiya Demokrasi (DEP) kişyayinê endamê meclîsa partî Habîb Kılıçî ser, şîbi Batman ke kiştowan vejê werte. La belê, a heyet rê jî vardayin virazyay. Vardayin de Mebûsê DEP Mehmet Sincar û sermayanê DEP'a Batmanî Mehmet Özdemir kişyabi.

Rojê kişyayinê Mehmet Sincarî û Metin Özdemir şarê Êlih ê cayê kişyayin de ard vîranîn. Vîranîn de tewrbiyinê nezdiyê hezar kesiya het, Cagenoyê Sekereterê HADEP M.Selim Özalp, Endamê Meclîsa Partî Cihan Sincar, Fırat Anlı, Cezayir Serin, Serokê HADEP'a Êlih, Sêrt û serdarê HADEP'a Amedî jî ca giroto. Tewrbiyayoxî banê HADEP ver ra heta kuçeyo ke Mehmet Sincar û Metin Özdemir kişyaybî wija şî. Wija deqeyê kewtî rêzgirotin û vilêkê sûrê ke xoya ardîbî înana cayê kiştin açarna baxçeyê vilikan û kiştowî jî lahnet kerdî. Vîranîn pey ra jî serdarê HADEP û nezdiyê 300 kesî erebana hetê keyeyê Mehmet Sincarî kewtî ray. Mehmet Sincar wija jî mezelê ci ser ro ame vîranîn. Xeynî (bê) şarîstanê Êlih, HADEP'a Stenbolî, Meletî, Mêrsîn, Manîsa, Îskenderun û şeharanê binan de bi çalakîyê reng bi rengî Mehmet Sincar ame vîranîn. Vîranînê Mehmet Sincar ê Stenbolî banê HADEP'a Bağcılar de tewrbiyinê Cagenoyê Serokê Giştî yê HADEP Osman Özçelik, Serokê Stenbolî Mahmut Şakar û nezdiyê hezar endamê partiya virazyay. Vîranîn de Osman Özçelik û Mahmut Şakarî kişyayina Mehmet Sincar û endamanê parti yê binan ser ro qisey kerd û wast ke kiştowî rojê ravey ivinyê.



MEHMET SINCAR  
1953-4 REZBER 1993 ÊLİH

*Ew mirovên xweşik  
Li wan hespên xweşik  
Siwar bûn û çûn*

*Di vê rîya pîroz û xweşik de ev  
sala pêncemîn e ku dîsa dilê ma bi  
hev re davêje.*

Li ser navê welatparwêzên Gundê  
Missuriyê

KAHRAMAN

**WELAT**  
ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

Xwedî (Imtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN

Yönetim Yeri  
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul  
TEL: (0 212)  
251 79 37  
FAX: 251 95 85

Genel Yayıncı (Genel Yayın Yönetmeni)  
SAMI TAN  
Berpîrsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.  
Yayın Koordinasyonu:  
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım  
NÜNERİTİYEN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Mêrsîn

Tel: 0 (324) 233 83 96  
İzmir  
Tel: 0 (232) 425 37 02  
München:

(Nünerê Giştî yê Ewropayê)  
Mahmut Gergerli  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871 670 815  
Swisre:

Ihsan Kurt  
Tel-fax  
41 21 652 76 07  
Hollanda:  
S. A. Fewzi  
Tel-Fax: 31 10 48 555 43  
Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yüsvi


*Gereke nîgaşî li nav şaristaniya Kurdistanê*

# Şaristani hê jî qebê dixwîne

Kela Amedê berginda çend şaristaniyan e? Gelo qet ristin û honandina van nihîtên bazalt bala nivîskarê me nekişandiye? Ew bilindiya bêiman. Ew bircên bi dûzen û plan, ew menzel û odêyên di ser hev re; ew deriyên hesinî û radayî, ev sazûman û sîstema ewlehî û parastinê, ew eqîdên bi kilsê cêyirandî.

**M**in îro (24.08.98) di rojnameyekê de nivîsêke rojnamevanekî kurd ku çûye bajarê Efesê dîtiye û lê heşmetkarî maye xwend.

Wekî ku min jê fêm kir, nivîskar pêşveçûn û şaristaniya Mezopotamyaya qedîm li ber a yewnaniyan biçûktir didît. Bi rastî gava ku nivîskar jî Efesê behsa tiştên balkêş, cihûkên av û beravê dikir, şaristaniya Mezopotamyayê, bi taybetî jî ya Kurdistanê di ber çavên min re derbas dibû. Ma jî bo ku em medeniyet û şaristaniya Mezopotamyaya qedîm bidin nîşan, gelo em ji ku dest pê bikin? Ma Kela Amedê berginda (bedela) çend şaristaniyan e? Gelo qet ristin û honandina van nihîtên bazalt bala nivîskarê me nekişandiye? Ew bilindiya bêiman. Ew bircên bi dûzen û plan, ew menzel û odêyên di ser hev re; ew deriyên hesinî û radayî, ev sazûman û sîstema ewlehî û parastinê, ew eqîdên bi kilsê cêyirandî. Lê sazûmana selebên avê ku di cihokê sihomandî re, bi deh metre di bin erdê re, li bajêr gerandine. Ma gelo kela hundirîn (iç kale) û Ava Enzelê. bala kê nakişîne? Ew wargehên di nava diwarên kelê de cihê xatûn û qralan, cihê leşker û nobedaran, cihê hesp û seyîsan temamên wan hîn jî wekî berê li ser piyan e. Tev di nava wî diwarê reş de bi-cihkirî ne. Pace û kozikên nobedaran wekî ku hîn jî mirov tê de bin, mirov dixin ços û heyecaneke mezin. Ma hewce ye ku mirov behsa bircên Heftbira, Sêbira û Ben û Senê bike? Hîn jî hiş û mêjiyê mirovan negihiştîye şaristani û teknîka wan. Bîrbirina avakirina wan deriyên mezin û bilind; Deriyê Çiya, Deriyê Mêrdîn, Deriyê Serayê û Deriyê Rihayê. Ma qey zanibûn ku wê di bin van deriyên re kamyon, otobûs û tanker derbas bibin? Têkûz û şehkirina wan tahtên hişk karêki çiqas dijwar e! Teknîka îro ku ew qas bi pêş de çûye jî dîsa li ber vê hunerê dibetile û teslim dibe. Ma, me bi gelê dinê, bi zorê daye pejirandin ku bibêjin Kela Amedê bi bilindî û heşmeta xwe di dinê de yekem e, bi dirêjîya xwe jî ya duyemîn e? Ev tiştêki diyar û li ber çavan e... Gelo hewce ye ku em hin tiştên ditir jî bijmêrin? Mirov dikare bi hezaran tiştan li Kurdistan û Mezopotamyayê bijmêre ku jî şaristaniya modern re jî bûne rêber û ronî. Kesê ku Mizgefta Mezin (Ulu Camî) a Amedê ditibe, çiqas bê fam û gejbê jî tiliya xwe gez kiriyê. Ev kevîr û stûnên şehkirî ku di Medresa Mesûdiyê de ne mirovan heyirî dihêlin. Mirov dixwaze bi rojan li wê keda milan, ronahiya çavan temaşê bike. Ma em jî hemû mal û baniyên vî bajarî re dikarin çî nebêjin? Her xaniyekî Amedê bi serê xwe ekolek e. Rewşandin û sipehiya xaniyên Amedê, çî ji derve, çî ji di hundir de, mirovan dikin evîndarên xwe. Kijan biyanî



Heskif

hatîbe. Li welat, bi taybetî li Amedê geriya be bi cildan pirtûk nivîsine. Ma me jî bo ku behsa bajar û şaristaniya me bikin bertil û xûgi daye wan? Çi kara wan di me de heye ku pesnê welatê me bidin? Ev çî ye? Ev rastî û heqiqeta welatê me ye. Ji ax û heriya vî welatî, jî kevîr û baniyên wî, jî çol û diyarên wê şaristani difûre. Li serê kijan diyarê ku rê û dirb pê nakeve, tu kijan kevîrî rakî jî binê wî şaristani û medeniyeta wekî behrê dertê. Ma ku ne wer bûna karê Ewropîyan çî bû li vir ku her tim tîn, di nav vî agirî de (şerê qirej) digerin? Tiştê ku hatiye talankirin û ê ku hîn nehatiye dîtin ne tê de, dîsa jî em tev dikarin bibînin ku welatê me behra şaristaniyê ye.

Bêyî dirêjkirinê tenê hinek nava bibêjin; Girê Kerxê (Üçtepe di nava Bismil û Amedê de) wargehiya heft medeniyetan kiriyê. Girê Tilelo (di nava Farqîn û Amedê de) dîsa werê. Hîn jî sirên Şikeftên Hesûna (li derdora Farqînê) nehatiye famkirin. Ma şehîrê Mêrdîn bi xwe ne xezîneya medeniyetê ye? Dêra Zahferan, Dêra Umur, Gundê Qiletê, Gundê Qiletmerê, Gundê Kela Pozreşa û bajarê Mîdyadê mirov dixê tûnela demê. Ya Çiyayê Nemrûd û Semsûr (Adiyaman) Semsat û Xerpêt hindik in? Newala Çorê kî nas nake? Di kolandina girekî nêzî Erxenê (Çayönü) de şopa jiyana deh hezar sal berê nehatiye dîtin? Her kevîrêki vî welatî dîrok e.

Ma pira Mala Badê bi serê xwe ne nîşana şaristaniyeke bilind e? Li çend heremên dinê teknîkeke bi vî tewrî heye? Bajarê Heskîfê bi wan mal û xaniyên deleqandî, di nava tahtan

de, bi wî çemê ku terbiye kiriyê û di binê xwe re diherikîne mirov bi kijan qozika dîrokkê de dibe? Lê mixabin çavê zikreşan bar nabe. Ev çend sal in bê xwedî bû. Îca îro goya lê xwedî dibin, wê dixin bin ava bendavê û bi temamî xerq dikin.

Ma kî dikare keke û bajarê Bilisê jî bir bike. Hemû lazimî û pêwendiyên xwe jî birine ser wî giri û xwe jî hicûm û êrişên Moxol û barbaran parastine. Bajarê Bilisê jî behn û çêja şaristaniya entik dixê firmik û binê zimanê mirov.

Ez nikarim saloxê dilin û heyecana ku Dêra Axtemar dide mirov bidim. Dêra Axtemarê di giraveke nava Gola Wanê de ye. Dêrê hezar salên xwe zêdetir jî qedandine. Lê hîn jî wekî nobedaraki dîrok û şaristaniyê, li ser piyan e. Wekî keçeke çardeh salî mirov dike hogir û evîndarê xwe. Devê pir mîmar û alimên vê demê jî li ber jihevkerî dimîne. Ew şekil û dîmenên hemû cureyên ajalan (heywanan) ku her çar diwarên wê dixemilînin û jî mirov re dikenin. Lê ew qaide û heykelên ku hatine talankirin, diz û keleşan birine nayê gotin. Ma mirov çawa paytexta Êrtartû, bajarê Wanê (Tuşpa) jî bir dike? Avahiya Qral Sardur, Kela Wanê mirov dibe heta berî zayînê bi nehsed salî. Tê de dewsa hemû pikolîyên hespên asûran, persan, yewnaniyan, roman, bizansan, selçûqiyan, osmaniyan, rûsan û tirkan xuya ne. Lê hîn jî bi rik li ser xwe ye û qebê li hov û talankeran dixwîne. Kele li ser girekî ku mirov dibê qey ne xwezîq e, bi destan ava bûye. Li rasteke fireh

cih digire. Aliyekî gir Behra Wanê, aliye dîtir jî daye quntara çiyê... Li ser wê ava şor bira şêrin di serê gir re derxistine. Diwarên wê ye bini pêşî bi kevîran di jor de bi dar û kerpiçan hatine lêkirin. Wekî ku mirov bi salan li ser gir bijî hemû lazimî û pêwendiyên xwe serast kirine. Mezelên (tirb) xwe jî parastina Danexistine rast û newalan, xistine nav rizdê kelê. Kele tevî girê xwe li dora hezar metroyî jî jêzeminê bilintir e.

Nivîskarê me li Efesê cihukên daşirê dîtîbûn û pir bala wî kişandibû. Lê ez dibêjim ma te Qesra Îshaq Paşa (ku li Bazîdê ye) dîtîye? Di wê sarayê de tiştê ku tu dibêjî heye. Di wê sarayê de ne tenê cihukên daşirê, cihukên kalorîferê jî hene. Saray jî sêsed çarsêd odên cur bi cur pêk tê. Ji cihê paşa, xatûn, qerwaş, xulam û xizmetkara bigire cihê alim û xwendevanan heta cihê mahkûman, cihê heywanan, dadgeh û hemû peywendiyên dîtir tev bi sazûmaneke aheng hatine avakirin. Sazûmana ava germ (kalorîfer) jî çêkirine û bi tewrêki ku li hemû menzelên sarayê bigere û germ bike, saz kirine. Ma pêwîst e ku behsa Kela Melazgirê bikim? Di nava deşteke rast de wekî marekî reş hîn jî li ser piyan e. Bi dehan artêşên Selçûkiyan, Persan, Bizansan, Roman êriş birine ser. Lê hîn jî ji hollê ranebûye û li ber xwe dide.

Digel vê rastiye em çima li paş mane. Gelekî ku bi hezaran sal bindest bimîne, nebe xwedî dewlet, nebe xwedî mêjî û ramaneke azad, dê çiyê xwe jî bir û winda neke?

Q. DÊRSILAVÎ